

DILNAME


3

1-2-2011

Rojnameyek Rewşenbîrî ye Serbixwe ye

ROMANIVÎS JAN DOST Û ROMANEK E NÛ©

**BEŞEK JI
ROMANA
JAN DOST
A NÛ***




Jan Dost
jandost@hotmail.com
(Almanya)

Ez li çareyekê geriyam ku ez û Kewserê hema mehê du caran be jî hevdu bibînin. Hespê işqeke bi tîn li dilê min likumî bû. Cara yekê bû ku hestên wisa pîroz, xweş û bi tirs û xweziyan re têkel dibînim. Evîn bû ew, evîneke gunehkar bû. Ez dil ketibûm wê keçika kurd î serbest î îtalîzan! Demeke min a dirêj li wan welatan nebuhurîbû jî lê min êdî naskiribû ku civaka şerqî bi tu rûyî hevdişîna mêr û jinekê, yan xort û keçekê ku ne tiştêkî hev bin, napejirîne. Behane çî be jî nabe, dixwazî bila fêkirina Quranê be jî nabe ku xortek li- ... **Dûmahîk Rûpel: 9**

HEVPEYVÎNEK LI GEL: MEELE E'BDELLA YÊ MELLE REŞÎD Ê XERZÎ©

((HIŞYARIYA KURDAN PIŞTÎ
ÇALDÊRAN Û MEM Û ZÎNA XANÎ
ÇÊ BÛYE))



Melle E'bdella yê Melle Reşid

(1925 – 2010)

Hevpeyvînek taybet ku hîn nehatiye weşandin li gel rehmetî Melle E'bdella yê Melle Reşid ê Xerzî. Melle E'bdella di hevpeyvînê de li ser jiyân û berhemên xwe, dibistanên kurdî, şiroveya dîwana Cezîrî ya Melle E'bdulsalam û Zivingî, û gellek babetên din diaxife: ... **Dûmahîk Rûpel: 19**

ZAROKEK, DÎROKEK Û DU ZIMAN*

Zimanê yekem, zimanê dê, yê malê, yê xwişik û bira û zarokên cîranan e.

Zimanê duyem jî yê mamoste, polîs, karmendên dewletê „muxaberat“ û pirtûkên pîroz e.

Qedera bindestî û serdestiyê herdu zimanan ajotin ber şerekî giran. Divê yek hebe û yê din tunebe. Divê yek bibe dengê erd û ezmên û yê din, ne li erdê û ne li ezmên, cihê jiyânê ji xwe re nebîne. Divê zimanek bibe kujer “qatîl” û yê din jî di nav xwîna birînên xwe de bêdeng bifetise û bimre. ... **Dûmahîk Rûpel: 10**



Helim Yûsiv

helimyusiv@hotmail.com
(Almanya)

BAQEK GULÊN SOR

Firat Cewerî*

firat.ceweri@comhem.se

(Stenbol)



Dilname©

Cemîl sibehê zû pir bi kêf şiyar bû, xwe di nava nivînan de bir û anî, bawîşkî, xwe vezeland, dû re xwe li ser piştê dirêj kir, destên xwe xistin bin serê xwe û li doh fikirî. Doh ji bo wî girîng bû. Ya ku ew bi salan li dû bû, doh qewimî bû. Belê, doh, li bîraxaneya nêzîkî stasyonê, li ber barê, gava wî ji xwe re bîrayek xwestibû û xwe dabû ser kursiya girover û bilind ya li ber barê, çavên wî li quncika bîraxaneyê ya tarî, li xanimjineke ku kurkê xwe avêtibû ser piştê kursiyê û bi xayizî bi tilîkên xwe yên zirav bi qedeha xwe- ... **Dûmahîk Rûpel: 17**

KOBANÎ

Ger kesek bikaribûya bi 100 salan paş ve vegeriya û ji ser kaşê Miştênûrê ber bi bakur ve binihêriya, heye ku va dîmena li pêş çavên xwe bidîtiya:

Li ser destê çepê û li bakurê Kaniya Murşid: rûbareke di nav beşine bi dar de ber bi rojhilat di rê de. Li pêş xwe: çend malên Mikteleyê û li paş Mikteleyê çend max û qubên Kaniya Ereban (navê Kobaniyê yê fermî ji vî navî dihêt: Kaniya Ereban; bi erebî = Ê'n-il-Ereb). Li aliyê rastê: Gund û mezreyên Deşta Sirûcê.

... **Dûmahîk Rûpel: 22**



Şahîne Bekirê Soreklî

shahinsorekli@hotmail.com
(Sydney)

KOLANRÊŞ

Berî ku rok ji hêlîna xwe hilê, berî ku rok tîrêjên xwe berde hinavê kolan û qelş û terkên dîwar û ruwên xelkê yê westiyayî, pêjna kolanrêşê taxa me berbang bi xwe re tevdida, rok şiyar dikir, bi bêdengiya bermalka xwe toz û gemara kolan û rexreyên perîşan, û ya li ber deriyê malan vedimalîşt û dida hev, bi bihnek fireh xirecira bêhna bermayên xwarin û qaşil û qutîk û şûşeyên vala û pîsiyê zarokên piçûk di bermîla gemarê de dicivandin, erê kolanrêşê taxa me, her sibeh ruwê kolanên me sipî dike, ji toz û qirêjê paqij dike,- ... **Dûmahîk Rûpel: 5**



Mehmûd Badilî

mbadili3@hotmail.com
(Hesekê)

LI ŞOPA DARWÊN


ÎNSAN Û

PÊŞKETINA WÎ

Kanî Çolbeg

rehwankurd1@hotmail.com

(Kobanî)



Tiştine pir caran têne bîra mirov, wek ku Însan ji kur hat? Çawa ghişte me?. Ya ku Arkolocist dibêjin, ji bendera vekolînên xwe: Însan berî (2) melyon sal li başûrê Efrîqîya û Esyûbîya dijiya, û yekemîn car di vekolanên ku li wê herêmê çêbûn bi rêvebiriya lêkolînvanên Înglîz wek Rêmon Dart û Lwîs Lîkî hestiyên Însanê yekem (**Astralopitecus**) hate dîtin, vî Însanî karibû yekem tişt û çek (Sîleh) çêbikira, lê bi rengê bê teknîk û fêrbûn. Termê vî Însanî kinik bû: (100 SM), giraniya wî: (30 KG) (Jin).


Li dû wî torinên wî hatin, yên ku hatin naskirin bi navê (**Homohabilis**), ev kesa li welatê germ û kêr av dijiya, hestî û serê wî vedigerin (2) melyon sal (B.Z), çekê xwe ye nêçîr û awê ji kevirê çeqmaq û kevirên berçemî hatibûn çêkirin, ji aliyê fizîkî de ji bav û kalê xwe pêşketîtir bû, bejna xwe: (150 S.M), serê xwe hinekî guloberbû, eniya xwe bi paşve vegeyayîbû, dev jî bi pêşve bû, diranên wî mezin bûn, nêçîra hinek Lawir dikir û mit û mol dixwar.

Homoariktos: Berî (1,5) melyon sal dijiya, yekemîn car li Endenosiya hate dîtin, ji bavê xwe dirêjtirbû, dirêjiya wî (150-160 S.M) bû, mejiyê wî jî mezintir bû, serê wî gulobertirbû, yekemîn Însan bû ji Efrîqîya derket û berve Asiya çûbû, û li deverên bi serma jiya.

Niyandirtal: Berî (100) hezar sal li rojhilat dijiya (Efrîn – Şanîdar – El-com), Însanê pêşketîbû di her awayî de, fizîkî, teknîkî, olî, hurmeta termê miriyân dikir. Niyandirtal nêçîrvanekî xurt û jîr bû, agir nasdikir, di şikeft û kendalan de mala xwe avadikir, dirêjiya wî (160 – 165 S.M) bû, karibû xweza di xizmeta xwe kira bi rengê baş. Lê ya ku em li ber disekin di zincîra pêşketina Însan de, xelesa di orta Niyandirtal û Homoariktos de, û Niyandirtal û Homosibiyans de wenda ye?.

Homosibiyans: Însanê ku çandinî dikir, û gundên biçûk avadikir, û kûçik malîkir, ji (6000 – 20000 sal B.Z) dijiya, çek û tiştên xwe yên nêçîrê biçûk û pêşketî bûn, fizîkiya xwe wek me bû, mîtolojiya xwe ji yên berî xwe pêşketîtir bû, nimêj ji hinek lawiran re dikir, wek: Gakûfî, Rovî, Mar, û hinekên din, şûna nimêjê taybet bû, wek ku hate dîtin li Sikir Ilihêmer (Til Temir) û li Ce'îdê li ser çemê Ferat nêzikî herêma Kobanî. Li dû Homosibiyans **Homosibiyanssibiyans** hat û ta ku em hatin.

(12-1-2011)



NASNAMEYEK

Mehmûd Derwîş*

Wergerandin ji Erebî:

Fadil Temo



Tomar bike!
Ez e'reb im
Û hejmara nasnameya min
Pênçe hezar e
Û zarokên min heşt in
Û nehê wan ..
Piştî havînekê dê bê
Ma tu dixeyidî?

Tomar bike!
Ez e'reb im
Û kar dikim li gel hevalên
rêncberiyê
Di kevirgehê de
Û zarokên min heşt in
Ez ji wan re
Nên û kincan û lînûskê
Ji latê derfînim..
Û destandeyan
Ji deriyê te pars nakim
Û biçûk nabim
Li ber serayên
esteneyan te
Ma tu dixeyidî?

Tomar bike!
Ez e'reb im
Ez navekî bê paşnav im
Bênfereh im di welatekî
Her çiyê tê de
Bi hilçûneke hêrsê dijî
Rehên min..
Berî zayîna demê xwe
berdan
Û berî pişkiwîna rojgiran
Û berî selvî û zeytûnê..
Û berî rabûna gîhê
Bavê min..

ji malbata gîsin e
Ne ji serwerên
malmezînin
Û bapîrê min cotarek bû
Bê so .. û bê binyad bû!
Ez fêrî pozbilindiya rojê
dikirim
Berî xwendina pirtûkan
Û mala min, kulika
zêrevanekî ye
Ji darik û sapan e
Ma te razî dike
payeya min?
Ez navekî bê paşnav im

Tomar bike!
Ez e'reb im
Û rengê porê min..
komirîn e
Û rengê çavên min..
mor e
Û nîşanên min:
Li ser serê min
(e'gal) yek li
ser kolozekê
Û lepê min hişk e wek
latê..
Xermûşank dike yê wî
dipelîne
Û navnîşana min:
Ez ji gundekî biteniyî..
jibîrbûyî me
Kolanên wê bê nav in
Û hemû peyayên wê..
li zevî û kevirgehê ne
Ma tu dixeyidî?

Tomar bike
Ez e'reb im
Te hemû rezên bapîrên
min
Talan kirin
Û erdekî min cot dikir
Min û hemû kurên min
Û te tiştêk ji me re..
Û ji hemû neviyên min re
nehîşt
Ji pêvî ev zinaran..
Ma desthilatdariya we
Dê bibiye .. weku hate
gotin!?
Dêmek!
Tomar bike .. li serê
rûpela yekê
Ez ji xelkê bêzar nabim
Û ti kesî talan nakim
Lê .. ku ez birçî bibim
Goştê zorkerê xwe ez
dixwim
Zînhar .. zînhar ..
ji birçîbûna min
Û ji hêrsbûna min!!

* **Mehmûd Derwîş:**
Mezintirîn helbestvanê
Filistîniyan e

ÇEND TEJ JI FIRTENEYA DIL



Inayet Diko

dikoo@hotmail.com

(Almanyay)

Ji ber Tentelîziya te
Şaşmayî mam
matmayî mam
Cinfirî bûm
Yarê
min ne hevoje deveran
min ne hurhutîn keleman
bi kulmê narim dirêşan

* * * *

Bimale
Bejna min
ji xwe re bimale
ji ber tîrkevaniya çavan
ji te re
dibim Ristemê Zale

* * * *

Keşmûniya dilan di payîza
civilî de
Dimixmîxe
Peşke, Vemale,
Vê gemarê daşkîne
Vê bêbextiyê veçînîne
Vî agirî biçurîsîne
Van derdan bimale De
paşke

* * * *

Damarên henarên memikên
te
ji ber kelgiriya min
Civilîn û kizirin
Lê dîsa ez li Kelepîriya
digerim

* * * *

Gulm li min turrîmîn
dest li min pirpîtin
dunya li min bû zirîşk
heyam li min bû zirt
pîra Kûpîçran û pişt xûzî
Bû mîvana min

* * * *

Ji singê pintiyatiyê vepekîm
Ji klûçeya navgundiye
vegezîm
Ji guvîştina tulîkan tevîzîm
Ji dost cîranan jî ez
verrişîm
Li dawiyê bi her tiştî hesîm

* * * *

Were Dîlberê hefsarê dilan
Veçengilîne
Kembera zêrîn nîk bi nîk
Tu biqetîne
Û ji nu ve
Ji yare xwe re kumekî
veçînîne

* * * *

Xortekî navgundî ...
lihevketî ... û dernexûn
Di riya yarê de velîst
Gotinî şekrokî û şilofî
ji Dîlberê re gotin

* * * *

Were yarê
Te deşta dilê min ji xwe re
şerriband
Belete, kewsan û zirçî
ji xwe re te gihand
Di nav lepên te de
Bûm sêwî û macûrê Wanê
Vemirîm
Gemirîm
Temirîm

* * * *

Te got: lawooooooooo
Were hambêzê
Guhdarke li Xelîlê Xazî
Halêm ne ma
Lêv li min bûne debazî
Nizanim xewn bû , yan
xeyal bû
Yan jî Darek ji darên çîlsazî

* * * *

Teska min şikest
Şorrên te bi min ve zemirîn
Di nav lêvan de xemirîm
Dîsa te soz ne da min
Kirtinî bi dilê min ket
Li min civiyan Horîk ,
Binewş û Şewket

* * * *

Dêndar bûm, dîndar bûm
Çirtim bi min re ne ma
li şûna Mertal û duvîtan
Hatim bi berger û çalepan

* * * *

Gurpinî bi dilê te ket
Lurpinî bi çavên te ket

Zurpinî bi pêjna te ket
Lêvên min remik û lal man

* * * *

Por zerînim ez
Li hemberî Bekoyan ,
nandozan
Perçîfîm
Ji ber Ewanan şilîfîm
Çav li min bûn
Kestelî, nêzmirî û
guhbeliya wan ne bes bû
lihevketiyê nav malan
Avêtin paş pişt min

* * * *

Bi nepirçekan ez kuştîm
Bi loman ez kûr kirim
Bi nandoziyê ez xwarim
Dil li min kirin repaş

* * * *

Pixtinî hate min
Gurpisiyê ez tirsandim
Por pêlikên min ji hev
vêbûn
Sewda li dilê min ket
û
Bûm pêrî

* * * *

Talan û hawar
Li deşt û gobeka eniyê
bûn mîvan
Û di şevê Sibate de
Bi Sîngîngê bi hev re
Lûs bûn

* * * *

Yarê
Çima tu xwe vedidizî?
Te dilê min lewitand
Te zimanê min çilîzand
Çima yarê ?
Tu gunehên xwe bincil dikî
Perspan û pîneyan li xwe
dikî

* * * *

Ketim temarê
Ne ma dilivim
Dilûlijim
Rihî li min bûn pejal
Dil li min bû ye lal
Remtele mam
Pejmûrde mam
Lê rûcesne, ez mêrim

* * * *

Tok bi stiyê min xistin
Tevna xwe li darxistin
Gurrnepsî ji xwe re
gihandin
Û pîr serî jî pekandin

TERISA SKANLAN



ŞAH A ÇELENGIYA AMERICA SALA (2011) YE

Keçika teze û nûgihîştî
Terisa Skanlan bi
temenê (17) salî wek
şaha çelengiya America
- **America Pagea Miss**
- ji sal (2011) an re hat
hîlbijartin.

Terisa ji herêma
Nibraska ye, û
sazbenda Piyano ye, û
nû xwendina xwe ya
lîse yê kuta kiriye.

Di dîroka pêşbirka
şaha çelengiya America
- (90) sal - ya ku di sal
(1921) an de hatiye
damezirandin, ew
çûktirîn çelenge ku taca
çelengiya America
qezenc dike û wek
xemlekê dide serê xwe
û pê bejna xwe ya
bedew dixemlîne!!!.

Terisa Skanlan bi vê
serkeftinê (50) hezar
dolar wek diyarî bi
destxist, û dê wan
dolaran li xwendina xwe
ya bilind di zanîngehê
de xerc bike.


Hêjayî gotinê ye, ku
pîvanên hîlbijartina
çelengan di vê pêşbirkê
de ne tenê bi çelengiyê
tête nixandin, ew bi
behere û lûk û şeweyên
danûstendinê jî tête
nixandin.

YÛSIF BERAZÎ
' BÊBUHAR '
(1931 – 2009)

Azad Berazî

zaraaza@hotmail.com

(Reqqa)



Yûsif kurê E'li yê Şêxo ye, pêşî cîwarê bav û kalên wî bajarê Kobanê bû, lê piştî fermana osmaniyan bav û kalên wî çûn bakurî bajarê Helebê li gundê Tilcîrcê bi cî war bûn. Di sala (1931) ê de li wî gundî ji dayik bû, di sala (1949) an de jê bar kirin û li Minbic ê bi cîwar bûn. Piştî şeş salan, ango di sala (1954) ê de hatin bajarê Serê Kaniyê. Berî ku bibe helbestvan dengê wî gelekî xweş bû, li tenbûrê "biziq" dixist û bi heval û dostên xwe re di civatên gelêrî de stiran digotin. Stiranên wek ku wî gotî hew di şevbuhêrk û civatên gelêrî de bûn. Di wê çaxê de tomarkirin tunebû.

Çîroka wî bi helbestê re dûr û dirêj e, berî di warê stiranê de, wî ji helbestê hez kir, û di rêya dan û standinê re jê re kar kir. Û seydayê nemir Cegerxwîn nas kir, û têkiliyên wî pê re xurt bûn, dîvre têkiliyên wî bi mamosta Reşîd ê Kurd re çêbûn. Wî jî hişt ew hînî rêzimana kurdî bibe. Mele Sîrac û Mele Reşîd hebûn, gelekê din jî hebûn, lê nayên bîra wî, ew di rêya van ciwamêran re gelek pirtûk xwendin, mîna Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, pirtûkên li ser pêlawaza, yên li ser dîroka kurdî û her weha pirtûkên bi zimanê farisî jî.

Ji sala 1966-1979 ê de, çî helbesta ku wî dinivîsand ji seydayê Cegerxwîn re dibir da ku jê re serrast bike.

Wî gelek helbest dane stranbêjan, yê pêşî hunermend **Mehmûd E'zîz Şakir** bû. Di sala (1967) ê de ew nas kir û gelek helbest tevî awazan dane wî, mîna:

Hebs û zindan, gotin û awaz Bêbuhar. Perwîn, gotin Rênçber awaz Bêbuhar. Rabe ji xewê, gotin û awaz Bêbuhar. Şînbû rîhan, gotin û awaz Bêbuhar. Eman dilo, gotin û awaz Bêbuhar. Gulîzar, gotin û awaz Bêbuhar. Dilê min her bi ahîn e, gotin Bêbuhar awaz mamosta Mihemed E'li şakir. Şêrîn tu cînara min î, gotin Bêbuhar awaz M. E'li Şakir. Mehmûd E'zîz çû êzgeha kurdî li Bexdayê û stiran li wir tomarkirin.

Pişt re **Se'îd Gabarî** derket, hat cem wî, helbest danê, ew jî evin: Koçê min bar kir. Hat xweş buhar. Bê bext felek. Di tarî da. Ew jî çû êzgeha kurdî li Bexdayê û stiran tomar kirin.

Hunermend **Mihemed Şêxo** jî ew nas kir, û gelek stiran dan wî jî, mîna: Hebs û zindan, Ez bûm ferar, Şêrîn tu cînara min î, Rabe ji xewê, Yarê şekir, Pismamo, Şeva tarî, Dayê (ez jî bi cî bim), Dayka dilovan, Eman eman, Çibkim bi can, Derdan çî ez dil jar kirim, Koçê min bar kir, Welat welat, Gulîzar, Eman dilo, Perwîn (gotin: Rênçber - awaz: Bêbuhar), Kûba û Vêtnam.

Û hindek stranbêjin dî jî hene wî helbest tev awazan daye wan, wek Zubêr Salih, Cemîl Şêxo, Mistefa Xalid ... hwd.

Berhemên Bêbuhar yê çapkirî:

1- Zindan helbest /1988. 2- Bang helbest / 1997. 3- Raperîn helbest /2002. 4- Serxwebûn helbest / 2006. 5- pêşketin / helbest (ji weşanên Semakurd) 2007.

Di (15/1/2009) çû ser mehdera xwe li bajarê Serê Kanî yê - li parêzgeha Hisîça – Sûriya.

NIVÎSKAR SALIH DEMÎCER Û
BERNAMEYA 'DOWN TOWN'

Bernameya Down Town ji welatê Libnan, ê û ji amedekirin û pêşkêşkirina nivîskar Salih Demîcer di Kurdistan TV de her du hefteyan carekê, roja Înê katjimêr (19:45) bi dema Hewlêr ê tê weşandin, û roja Şemî yê katjimêr (11:50) tê dîbarekirin.



Down Town ronahiyê dide ser çalakiyên rewşenbîrî wek aheng û vestîval û şevbuhêrkên hunerî û wêjeyî yên ku li Libnanê çêdibin, û roleke baş di navbera stêrk û kesayetiyên e'reb yên xwedî rol û cemawerê kurd de dilîze, ango ji alîkî de çalakiyên e'reban li Libnanê bi cemawerê kurd dide nasîn, û ji aliyê din de jî dezgeheke ragihandina kurd wek Kurdistan TV bi stêrk û çalakvanên e'reb dide nasîn.



Xeleka yekemîn ji Down Town di Tebaxa sal (2009) an de hate weşandin, û ta vê demê derdora (30 – 40) xelek î bê qutbûn û rawestandin û bi regekî berdewam jê hatiye weşandin. Di her xelekekê de çar babet pêşkêş dibin, û di her babetekê de jî sê mîvan pêşwaz dibin, ango hijmara mîvanên wê (200) kes derbaskiriye.



Wek mînak ev hin kesayetiyên ku di Down Town de hatine pêşkêşkirin: Şivan Perwer, Durêd Leham (Xewar), Cemal Silêman, Sûzan Necmedîn, Nûr Şerîf, Hisên Fehmî, Wedî'î Safî, Elîsa, Waêl Kiforî, û hin wezîrên libnanî wek yê rgihandin û rewşenbîriyê.

KOLANRÊŞ ... Dûmahîk:

-ta radeyekê ku nedihîşt mêş bi xwe bi bermayên xwarinê şa bibin, çimkî berî wan jî şiyardibû.

Her sibeh dema ku Pêşwar diçû ser karê xwe, yê kolanrêş li pêşîya xwe didît, bi dilxweşi silav lê dikir û kîsê gemarê dida destê wî, ew jî pirr kêfxweş dibû, bi dilniyazî dibişirî, diranên wî yên ku ji dûyê çixarê û tirumbêlan zer û reşkerimî bûbûn ji nêv reş lêvên wî ku carê ji hev vedizelîyan beldibûn, sumbêl û riha wî ji kul û derdê jiyane, ji toz û raz û çîrokê ku bi dehên salan ve di rêşkirina kolanan de buhirtiye, rengê xwe yê cûn wergirtibû, dîsa jî bi wê silavê re diçirîstî wek xunava li ser ruwê gulek çelmisî.

kolanrêş xwe bi vê silavê didît, bi hebûna xwe hest dibû, ji xwe re digot :

" ev deh salên min ez li vê taxê dixebitim, ez qirêj û gemara wan didim hev, ez razên wan diparêzim, rojekê yekî silav li min nekiriye, tenê ev zilam, xwedê jê razî be, mamosta Pêşwar, bê silav di ser min re derbas nabe...lê axx.. ax bes hema ne ev xû û torê min ba, lê ez çibikim.. nikarim .. nikarim, ku wilo nekim nikarim bijîm.."

Pêşwar jî mirovekî ji dil û can mirove, gêrikek mirî li erdê dibîne dilê wî bi wê dişewite, ji paqijiyê hez dike.

Carekê ez li pey wî dimeşîyam, serê wî di ber wî de û diaxivî:

" hahoo ev ne beşerin, ev ne insanin, hema hindik maye ku gemara wan têkeve qulên çavê me, emê çawa pêşkevin heee..., bes ka t'ê ji kê re bêjî, û gava tu ji wan re dibêjî, tinazîyên xwe bi me dikin, dibêjin te: "de here looo, tu dibê qey baqijbûn li ser me maye..., yan bi serê me ketiye..". Kuro hema va şagirtên min.. destên xwe lihev dixê û dibêje: Di her dersê de ez pênc deqa li ser paqijiyê ji wan re diaxivim, gava ez dibêjim paqijî, devê wan jihev dihere, çavên wan dibelîqe, û dibe hîrehîra kenê wan.. dibê qey tu ji wan re behsa gawirekî yan tiştêkî biyan di jiyana wan de dike.. "

Silava Pêşwar di dilê kolanrêş de bi dilxweşi cih girtibû, kolanrêş jî hêdî hêdî xwe nêzîkî Pêşwar dikir, têkilîyên wan jî roj bi roj xurt dibûn, her heftîyekê carekê Pêşwar li ser rêya xwe pere dida wî, carina sed, carina bîst û pênc..tu dikarî bêje serê du - sê salan bi vî rengî pê re dida û distand.

Her carê Pêşwar dihat malê ji jina xwe re digot: Dîsa îro min pêncî werqe da yê kolanrêş, yan sed..

Jina wî jî di ber xwe de diqîçiqî, di got wî :
" aniha tu dînî, gelo tu bi hişê xwe yî, ez nizanîm te çi di yê kolanrêş de ecibandîye.. " û-

-Pêşwar li jina xwe vedigerand:
Keçê feqîre feqîre.. bawer bike gunehê min pê tê.. û tu dizanî xêr li feqîra dere..

Wê jî lê vedigerand:

"Feqîrtiya wî bi serê me ne ketiye, dûvre ew li cem hikûmetê mûçexure û mûçeya wî jî heye, ew sed wereqê ku tu dide wî bide yekî ku bi rastî feqîr be.. ne ev tûlê ha.."

Her çend rojan, ev xirecir di navbera Pêşwar û jina wî de lidardiket, ta radeyekê ku cîran û xelkên li hawîr wan bi qerebalixên wan dihisyan .

Rojekê cîran li ser deng û qerebalixa Pêşwar û jina wî ve hatin, lê kesekî nizanîbû ji bo çi şer dikin, hineka digot Pêşwar dil ketiye keçeke din, û hineka digot jina wî noye wek agira sore, halê vî feqîrî jî ber tune, hineka digot ev zilam wek ava bin kayê ye, dibêjin zewiciye û zarokê wî jî ya dinê hene..

Piştî qerebalix sarbû, cîranên wan ew lihevanîn, rabû li hewşê pîrek li hêlekê û zilam li hêlekê rûniştin, hûn dizanin çîrokê pîreka pirrin, peyvek ji vir û yek ji wir, şêwir xweşdibû, di guhê hev de dikirin pistepist, yekê ji wan jinan nema xwe girt, got: Aniha hûn çi di guhê hev de dikin pistepist, tiştêk heye bila em tevde zanibin..

Tevda li hev dinerîn, sar disekinîn, yekê ji wan got: Porkurno bi xwedê tiştêk heye lê ez newêrim bêjim.. gelo bi were jî çêbûye yan na..?!

Dîsa li hev dinerîn lê ceger nedikirin ku ji hev re bêjin, wek ku her yek ji wan li xwe diket gumanê tiştê ku bi wê re çê dibe, gelo bi ya dinê re jî çê dibe... bi vî rengî di navbera gumanê û pistepistê de roj çû ava .. û her yek çû mala xwe, ew pey û çîrok ma hisret di dilê her yekê ji wan de .

Rojek dudo, sisê, çar.. çi gava Pêşwar diçe karê xwe nema yê kolanrêş li ser rêya xwe dibîne, di wan çend rojan de bêhna kolanên taxê derketibû, nemaze dema ku ba radibû, pel û toz û bêhnek pîs li poz û ruwê mirov diket, bihna yekî ji ber wê bêhnê diçikiya .. û roj bi roj bêhna wê pistepistê jî gurr dibû, û pîrekê taxê li hev gurêx dibûn, lê kesekê raza xwe nedida ya din.. vê dawiyê zilamê taxê jî li hev kombûn, ji hev re gotin divê em çareyekê bikin, tax bê kolanrêş nabe, em ji ber vê bêhnê genîbûn.. yekî din lê vegerand û got: Ma taxa me tenê genîye, ev welat tev genîbûye.

Pêşwar jî diponije û bi mebesta windabûna kolanrêş pirr mijûle, her carê ji xwe re dibêje çi bela wî ye.. çima nema xuyabû.. gelo çi hatiye serê wî..?

Di vê navê de dîtînan ku tirumbêla-

-gemarê û çend kolanrêş li pey wê ne û bi kolana taxê ketine gemarê jê didin hev, Pêşwar bi lez ber bi wan de reviya, û pîrsa kolanrêşê taxê ji wan kir, ewên ha jî yek nekirin dudo gotinê : Çû mala xaltîka xwe.. Pêşwar jî ji dilpakiya xwe got wan gelo hûn dikarin mala xaltîka wî pêş min bikin..?!

Yê dîtîr lê vegerand: Birako xuyaye tu ne li vê duniyê, ji te re dibêje çû mala xaltîka xwe.. yanî nuha di zindanê de xewna stiyana û kelsona dibîne..

Pêşwar matmayî ma, û li pêş wan gêj û tewş bû, zindan, stiyana, kelson.. mala xaltîkê.. nema dizanê dê çi bike.. hema li koma zilamê taxê vegeziya, û ji wan re got dibêjin di zindanê de ye..

Çîroka zindana kolanrêş li taxê belav bû, zarok û jin û mêr tevde tede diaxivîn, îca her yekî ji wan ji xwe re çîrokek li ser digotin, yekî ji wan got hûn dizanin rojekê ez derketim destavê berî limêja sibehê, min dît yê kolanrêş li ber pencereya mala me rawestîyaye, wek ku guhdar dike, gava ku ez dîtîm xwe bi rêştinê ve mijûl kir, hema wê gavê lê ketim gumanê ku ev mêrik razek wî heye.. yan altaxe, yan jî destê wî nepaqije...

Yekî din got tiştê ku ez dizanim, yê kolanrêş du caran zewicî ye, lê kurdûndabû.. zarok ji wî çênedibû, lewra herdû jinên wî jî xwe jê berdand..

Yekî dîtîr got bi rastî ez çîroka wî baş dizanim, carekê mirovek ji hêla wî cihê ku berê lê rûniştibû hat mala min, û got: "pismam ev kolanrêşê taxa we bavê min ew xwedîkiriye, hîn temenê wî heyst salî bû, me wî li berrîya çiyayê Şengalê dîtîbû, sêwî bû, ne dê û ne bav, rabû bavê min ew xwedî kir, bû wek yekî ji malê, (carê digot ez van tiştên ji te re dibêjim divê ji devê te dernekeve), lê bênamûso wek yê têkeve arvanê xwediyê xwe, carekê dest avêtîbû jina yê cîranê me, û carekê dêya min ji bavê min re got: Ha wey ezê her sibeh cila ji ser têtê bînim, tişkî xerîb û ecêb ez dibînim, lawoo derpêyê min yan navran qetiyaye, û yan jî ne xuyaye..

Rabû bavê min ew zewicand, lê piştî- ... **Dûmahîk Rûpel: 6**

KOLANRÊŞ ... Dûmahîk:

-du salan zarok ji wan re çênebû, wê jinê xwe jê berda.. pişt re windabû.. ta me naskir ku li taxa we kolanrêştîyê dike".

Bi rastî min ev tişt ji wî mêvanî li ser yê kolanrêş naskir, û ji wê rojê de min noq jê vala dikr, min zarokê xwe jî temînkirin ku divê bi topraxa wî nekevin, û min ne guh didayê û ne silav lê dikir.

Pêşwar jî, ji ber van çîrokên ku dihatin gotin hema devî wî ji hev çûbû, dilsar di wê civatê de bê peyv û liv rawestîyayî mabû, dilê wî dikir gurmîn, lêwê wî zîwa bibû, ruwê wî sor dibû, şîr dibû, zer dibû, hema ji nişkêve rabû berê xwe da malê, û bi rê de ji xwe re digot: Ez çi ker im, bi xwedê ez ker im, ne ez bim û ne ew guhdana ku min bi yê kolanrêş dikir, kolanrêş lawoo, zindan, stîyan, kelson, kî bîra xwe û dizîya kelsona bike lawooo, dizîya dellîngê jina bike kuroo, wellehh wê dunya xerabibe, û her dihere ber bi xerabîyê ve diçe.. ê qey raste bavo, yê qirêj xwe li qirêjê digire .., na na ne wa ye, ev gotin ne raste, çimkî pîrr jêhatî bû, kolanên taxê dikirin wek zêr yahoo.. dîsa li xwe vedigerand û digot: Gelo jina min hayê wê ji çîroka wî hebû, le çima bi ser serê min de dikir qerebalix.

Bi vî rengî çîroka yê kolanrêş li taxê tevî belabûbû, ku kelson û derpêyê pîreka didizît û şevê xwe bi temaşekirina wan dibuhirt, çavê xwe têrdikir, dilê xwe pê hênîk dikir, agirê arezûya xwe pê geş dikir, delleng û sitiyan wek jina wî bû, jiyana wî bû.

Kolanrêş di wan sê salên di zindanê de borî bêpar bûbû ji dîtin û hilma dellîngan, jiyana li pêş çavê wî reşibû, bûbû wek zarokê tu wî ji şîr veke.

Rabû rojekê ji kerb û xema di hindirê xwe de xerpişî ser sînga yekî hebsî û bi kûlm û pêhna lêxist, bi zorê ewê ha ji nav destên wî derxistin, pişt re ew avêtin zindana tekane, bêtir cih lê teng bû, dema firavîne derî lê vekirin, sênîka xwarîne li ber danîn, bang danê deng jê nehat, yê berderî pêhnek lêda lê liv jê çênebû, gava xwest wî ji erdê rake, dît ku derpîkurtê xwe li qirika xwe gerandiye.

KOMCIVÎNA NAVNETEWÎ YA NIVÎSKAR Û WERGER Û WEŞANGERAN LI STENBOL Ê

Di (7,8-01-2011) an de li bajarê Stenbol ê komcivîna navneteweyî ya nivîskar, werger û weşangeran ji herêma Ewropayê - Derya Spî lidarket. Nivîskarê kurd **Helîm Yûsiv** ew jî yek ji beşdarên komcivîne bû, û ji bo pirsên rojnameya **Dilname** ev agahiyên taybet diyarkirin:



Komcivîna ji aliyê rêxistina LAF "Literature across Frontiers" û bi hevkarîya Anatolialit Ajans, hate lidarxistin.

Armanca çalakiyê ew bû ku nivîskarên milletên bê dewlet bîn cem hev û bi hev re li riyan piştgiriya wergerandin û danasîna wêjeyên van zimanên ne fermî bigerin. Ji bo vê yekê nivîskarên Baskî, Katalanî, Samî, Welşî an Gallerî û Irlendî amade bûn. Her nivîskarekî-e beşdarî behsa serboriya zimanê xwe û wêjeya xwe li hember zimanên serdestan kirin, û baldarî li nivîskarên Kurd jî guhdarî kirin.

Nivîskarên Kurd jî hem li ser rewşa her du zaravayên Kurdî, kurmanî û zazakî, û hem jî li ser rewşa kurdan û zimanê wan ya siyasî axivîn.

Komcivîna weku "workshop" li zanîngeha Bilgi li Stenbol ê çêbû. Nivîskarên beşdar ev bûn:

Amaia Gabantxo: Nivîskara baskî, behsa ziman û wêjeya welatê Baskî kir.

Ramon Farres: Nivîskarê katalanî jî behsa ziman û wêjeya Katalanan kir.

Her du nivîskaran jî bal kişandin ser wê yekê ku rewşa Baskî û Katalanî jî heta mirina diktator Franko weke ya kurdî a niha bû.

Gabriel Rosenstock: Nivîskarê Irlendî, bi awayekî qerfî û hestiyar behsa tekoşîna irlendîyan ya ji bo serxwebûn û azadiyê kir, lê piştî ku serbixwebûna xwe bidest xistin, hema hema zimanê xwe windakirin.

Francesca Rhydderch: ya Gallerî behsa zimanê welşî û edîtoriya kovara Script kir, ya ku bi sê zimanan (Ingilîzî, firensî û elmanî) weşanê dike. Herwisa ev hejmara (36) an taybet ji bo mijarên wê komcivîne hatiye veqetandin.

Brahim Tazaghart: yê emazîxî ji Cezayirê hatibû û behsa rewşa zimanê emazîxî û weşanên bi wî zimanî li Cezayirê kir.

Vuokko Hirvonen: ya zimanê Samî. Behsa qedera ziman û milletê xwe kir. Ev millet di navbera çar dewletan de par ve bûye (Siwêd – Finlanda - Nerwêc û Rûsya yê). Tev dora (30 - 60 000) jî bi vî zimanî diaxivin, lê tev wilo jî ew zimanê perwerdeyê ye li Finlanda û Siwêdê û Nerwêcê.

Karolina Ryvolova: ya Çekî, xwedîya lêkolîn û agahiyên berfireh li ser ziman û wêjeya "Romanan" weku di nav xelkên me de Qerechî tene binavkirin, bi dirêjî behsa vê mijarê kir.

Ji nivîskarên Kurd:

Roşan Lezgîn, Deniz Gunduz û Ihsan Espar behsa rewşa zimanê kurdî û wêjeya bi zaravayê zazakî kirin. Perlemerter û nivîskar **Osman Özçelik** bi awayekî berfireh behsa kirinên dewleta Tirk yê li dijî kurdî kir. **Zana Farqînî** behsa karê xwe yê dijar yê amadekirina ferhenga kurdî - tirkî kir. **Ronayî Onen** ku weke mamosteya kurdî li zanîngeha Bilgi tê naskirin behsa rewşa kurdî li Bakur û Turkiyê kir. Şanogera Kurd **Berfîn** li ser rewşa kurdan û şanoya wan rawestîya. **Irfan Guler** behsa karê xwe yê wergerê û serboreya wergera ji zimanê Galîsî kir. **Suleyman Çelik** behsa kovara Nûbuharê kir. **Hasan Ozgunes** weku nûnerê rojnameya Azadiya Welat behsa zora li ser kurdî û li ser rojnamevanên kurd kir. **Mezlûm Dogan** jî ku ji Hewlêrê hatibû behsa kar û barê instituya kelepura kurdî ya li Hewlêrê kir. **Helîm Yûsiv** behsa wêjeya ku di nav sînorên dewletên qedexekar re şîr tê kir.

Civîna bi birêvebirina **Alexandra Büchler** nûnera LAFê û **Dilek Akdemir** û **Amy Spangler** xwediyên Anatolialit Ajans çêdibûn.

Roja duyem jî nivîskar li sê komikên biçûk hatin parvekirin. Mijarên ku hatin axavtin, bi çend xalan hatin destnîşankirin. Ber êvarê jî beşdarî berhemên xwe bi kurdî, katalanî, baskî, samî, romayî, emazîxî û irlendî xwendin.

Hêjayî gotinê ye ku piraniya van berhemên ku hatine xwendin wê bi ingilîzî, elmanî û firensî di kovara wêjeyê Script de bêne weşandin.

DAYÎK BI (D) DEST PÊ DIKE!**Xelek (3) û Dawî****Mistefa Can**

Werger û amadekirin:

Salih KOBANÎ

kobani@spray.se

(Swêd)



Bi haliyê Xêriyê ve çû: eze a niha gullakê berdim serê te, ku tu nebêjî ka keça te li kuye. Xêriyê pir hêz tê de nemabû lê dîsa karê xwe kir tev birînên xwe, devê xwey tije xwîn û diranên şikestî, bi hemî hêza xwe, car dî tife nav çavên wî kir.

Wî leşgerî berê dabançeyê da haliyê çepê ji sîngê Xêriyê û bê poşmanî gulle berda. Xêriyê piçekî vepirtikî, sist bû, azad bû ji îşkenceyê. Bê ku ti tiştî bêjin ji hevve, yan ji gundiyan re, hemiyar li hev nihêrî, kome ser hev bûn, û dane rê.

Xêriyê ne mêr bû ku jiyana xwe ji bo azadiyê pêşkeş kir, Xêriyê dayik bû, tu zanî çiyê dayik bû ? Ne dûre ku Xêriyê nizanibû azadî çiyê, welat, mafê jinan, mafê mirovan, çiyê, lê baş dizanibû ku keça wê cegera wê ye, dikare jiyana xwe di ber zaroka xwe de deynê.

Keça Xêriyê navê wê Nevîn e, pêşmergeye, ez wê nas dikim, piştî ku wê çîroka kuştina dayka xwe bihîst gote min: Ji niha û pêve ku ez pesnê qehremanekî yan qehremanekê bidim, ez nabêjim ti carî "ew qehreman û netirs wek mêran bû" eze bêjim: Ew qehreman û netirs wek dayikan bû!! (divê mirov qehreman û netirs be wek dayikan).

MIN ŞERM E

Sal 1979 e, ez û hevalên mine sinifê em sinifa nehê ne, li dibistana (Rîd Skola) li bajarê Xuvdê - li Swêdê, rojekê berî cejna çêbûna Îsa, hemî dilxweşin bi diyariyan, bilind dikenine, arangiyar dikine, lê ez ne di nav vê tirşikê de me, tevî ku cilê (Baba Niwêl) li min in, bi diya xwe re rawestiya me, û ji wan û diyariyê wan çavteng (hasûd) dibime, ez li xwe dimeyîzim û li diya xwe dimeyîzim min dî ku ez ji ber diya xwe ve şerm dikim!! Ne weke hemî dayikên dî, ne cilê wê weke wanin; dayikên swêdiyan bê desmalin, porê xwe bi heft rengan kirine, şaleke li ser serê wê ye, wan cilê kin li xwe kirine û piyê wan rûtin, diya min bi keras û xeftan e, hemî dayik bi yek dengî strana vê cejnê dikine ... ew stranê jî nizanê ... yekemîn care diya min bi min re dête dibistanê, piştî 24 salan, û yekemîn care ez ji ber wê ve şerm dikim, ti carî min ne dixwest bi min re werê dibistanê tevî ku gellek caran girng bû, hebûna bav yan dê ... diya min hate şahiya bi dawîkirina dibistana navîn ya birayê min, û gava ku xûşka min e mezin, sinifê nehan bi dawî kir, diya min bi xwe re bir. Diya min bi cilê kurdî hat şahiyê, ew bi tenê balkêş bû; tevî ku min wek zarokên swêdî cilê sipî li xwe kiribûn, tevî ku min ji hemiyar xweştir distira, tevî ku dengê min bilidtirîn û cwantirîn bû di nav hevalê min de, û min tim dixwest ez yek ji wan bim.....

- ez dê çawa yek ji wan bim ku dayika min bi desmal e, keras û xeftan û bervanek e? dayika min nikare tirumpêlê bajo, min bigihîne cihê futbolê weke dayikên swêdî, nikare min fêrî dersê min bike weke dayikên swêdî, dayika min xweşik bi swêdî nizanê. Dayka min di pûk û berfê de li ser belkonê agir pê dixist û nanê tîrê dipat. Carekê cîranan xeber dane polîs, gotin agir bi mala me dikevêye, -

-polîs û komek agirkuj (îtfaî) hatin ber mala me û dîtin ku diya min nêrî dipêjê, serê xwe hejandin, û yekî ji wan gote hevalê xwe: Bi xwedê ev jina dîne!!! Wê çaxê ji şermê, min got erdo biçire û min bibe.

Diya min vaye nasnameya mine, tevî ku ez jirtirîn bûm li dibistanê, xweşiktirîn û xurtirîn bûm, Yassika ew cwantirîn keçika dibistanê hevala min bû, ewa ku dilê her kurekî dibijiyayê.....

Ma ber çî digre, ku hevalê sinifa min pir ji diya min hez dikirin, ji ber ku wê bane wan dikir ku xwarinê bi me re li mal bixun, xwarinên kudrî yê dilê mirov dibijê wan, ew xwarinên rengo rengo ...

- Bixun, bixun Frêdik, Johan, Pêtir ... bixun bila noş û can bê, û lalîkên wan tije xwarin dikir, û bi rastî wan jî hinde hez ji xwarina diya min dikirin, ku dilê wan nedixwest xwarinê destê diyên xwe bixun, xwarinên swêdî. Diya min xwarin dida wan û zanibû, ku dayikên hevalê min yê swêdî, xwarinê li mala xwe nadin e min, û ne jî didine kesekî dî, ji hevalên zarokê xwe, gava ku min jêre got: Yadê .. dayika Frêdrîk, Pêtir, Johan, ticarî ji min re ne gotine were xwarinê bixwe. Di bala diya min de, ku xwarin di malên swêdiyan de nîne!!

Ew nizanê ku dayikê hevalên min ez dixistim hindir odeyekê, û digotin ka ji xwe re vê pirtûkê bixwîne heta kurê min xwarinê dixwê !!!

Îro, ez bi rastî ji ber xwe ve şerm dikim, gava ku ez va tiştina tînime bîra xwe, heta sinifê nehê jî, min nikaribû girîngiya diya xwe bipîvîm!!!

Ew çend westiya di ber me de, gava ku em li gundbûn, û bavê min hatibû Swêd ji bo kar.

Çawa ew pê re digihîşt tirşkan bikelîne berî ku biçê nav zeviyan, hê em di xewda ne, berî ku ro hilê, û dest bi karê xwey rojane bikê.

Ku ro diçû ava ew divegeriya mal, divê şîv bikira, cilê me li ser kaniyê bişuştana, piştî mal bida hev, em di xew kirana, û bi xwe jî ne diraket!!

Carne berî ez rakevim min bi dizî li wê guhdarî dikir, ew li ber Xwedê digeriya: Xwedêooo, ez di bextê te de me, tu hêzê bidî min ku ez karibim xizmete zarokê xwe kim, ku ez karibim wan mezin bikim.

Ti carî ji bo nefsa xwe li ber Xwedê nedigeriya!! Ti carî kifrî, yan gilf bi xwedê re nedikirin, ti carî gazin nedikirin.

Wa lê hatibû ku em heşt zarok li ber siya dîwaran mezin bibin, di nav toz û gemarê de, pêçiyên nigê me her birînbûn, hê ku di keviran de lêkevin, me paç li hev digrandin, dikir top û pê dilîst, li cihê fûtbolê.

Em hatin Swêd, pêy bavê xwe ketin.

Tevî ku li swêd zehmetiyên aborî nînin, tevî ku dewlet di gellek waran de alîkariya hemwelatiyan dikê, û destê xwe di ser mirovan re digrê, dîsa jî diya min ti rihetiyeke berçav nedît; li cihê argûn, va fîra li ser kehrebê heye, şûna ava kaniyê heneffî heye, cihê odeyekê pênc ode û du serşokê me hene.

Rûniştina diya min li siya malan û axaftina bi jinê gûndî re çû, şahiyê gundane mezin çûn, bihevçûna jinan di paş serê zarokan de, ya jî ji bo mirîşkan çû, jiyana wê di nav çar dîwaran deye, li gor pêwîstiyên me jiyana xwe dikir ...

Tiştê herî baş ewe ku pênc ji me bûne malbat, û zarokê wan hene, 22 yan jî 23 neviyên dayika min hene, ew bi me û neviyên xwe gellek serbilind û şahnaz e.....

Heya niha jî min ji wê re negotiye, çima min ew bi xwe re ne dibire şahiyên dibistanê, heye ku, şarma min ya herî mezin ne ji ber wê ve ye, lê şerm ji wê ye.

Çawa mirov ji dayikekê re bêjê: Min ji ber te û desmala te ve fedî dikir!! Ew diya ku tevahiya jiyana xwe di ber me de şewitand.

... Dûmahîk Rûpel: 8

DAYÎK BI (D) DEST PÊ DIKE! ...

Dûmahîk:

Dayê ... tê bîra te, wê rojê, gava min tu dibirî frogehê (airportê), ji bo te verêkime Kurdistanê, min ji te re got: Heye ku ez di radioya swedî de li ser te bi peyivim. Te got: li ser min?!

Kurê min .. çi tiştî girîng li ba min heye ku tu li ser bi axivî, û di ku de Di radioyê de!!!!

Dayê Tu niha min nabihîsî, ma ku tu min bibhîsî jî, tu nizanî ez çi dibêjime ji ber tu bi swêdî baş nizanî.

Niha tu li gund î, di nav ew mirovên ku ji ber te ve şerm nakin de, li gel hevalê xwey zaroktiyê, di nav gelê xwe de, mirovên xwe de, ew kesên ku jiyana wan jî wek jiyana te bû, heye tu ji wan re dibêjî, ku Te destê xwe ji min şîştine ji bo çiroka jin anînê, heye ti ji wan re dibêjî: Hema bila min zarokê Mistefa jî bidîtana, min ti tiştê dî ji Xwedê nedixwest, heye jî te piştî xwe dabê wê dara gozê ye mezin, ewa di nivê gund de, û hilma rîhanê ji aliyê çiyar ve bi ser we ketibê, û tu ji wan re dibêjî: Va Mistefayê min yê herî ser hişk di gund de, ser nerm bûyê, nebû duktur .. lê rojnamevan e, êh ew jî ne xerabe, karê wî jî çê xerab baş bi rêve diçê, tevî ku hê jin ne înayê.

Min karê xwe nekiribû ez va tiştan bi giştî bêjim, bi kêmanî ne li vir û di radio de, min dixwest bihêlim di serê xwe de cwantir bikim, tevî wî hawî jî va ez dibêjim e, tevî ku di cihne de mirov bi rastî şerm dikê. Ma va cihê vê gotinê bû te kir?! Lê ez dixwazim ku ev gotinên min bibin gul û gîha, bibişkifin li her derê, di ber kevîran de nemînin, kesk bibin, geş bibin li ber dilê daykan, ku li tevahî cîhanê bigerin, bibin pêlê avê, berê xwe bidin nemirînê Ez dixwazim ji te re bêjim dayê: Ez ji nivê dilê xwe, bi hemî heza xwe, berê, niha, û ta ku jiyana hebê, EZ JI TE HEZ DIKIM, bê sînor, lê ez ti gotinê dîtir nikarime peyda kim, ku karibin cihê xwe bigrin. Lê ez nikarim bêdeng jî bimînim.

Ez bê nan û bê xwê me, eger ez bêdeng bimînim dayê. Hemî raman, gotin, evîn, rûbarên ava jiyane, dengê zengilê kinistan, awazê ji mizgeftan, despêk dawî bi tevayî ji te dest pê dikin û li ba te bi dawî dibin Dayê. (Dawî)




Mistefa Can

Tabloyeke hunermend:

Mihemed Seyda

mihemedseyda@hotmail.com


(Swêd)



Dilname©

XWE**SANSÛR****KIRIN**

Seyda@live.se

Karîkatoreke karîkatorîst: **Inayet Dîko**

dtkoo@hotmail.com

JI GORISTANAN**GORA****Hunermend Hesên Zîrek**

(1921 - 1972)

LI BAJARÊ BOKAN

Dilname©

Ev wêne ya gora hunermendê kurd yê navdar û nemir Hesên Zîrek e, li bajarê Bokan ê - Rojhilatê Kurdistanê - Iranê ye.

PÎROZ BE DILNAME

Dilname©

Xelîl Misto

zarakobani@hotmail.com

(Kobanî)

Rojnameya Dilname di demeke girîng û pêwîst de hat, hinekî xwendevan mijûl bibû bi aloziya rewşa aborî û siyasî de, nameze li hindir welat, Dilname bû sedemek bingeîn ku xwendevan karibe têklyên xwe bi berhemên nivîskarên hêja re avake û bidomîne, û bû hevgirtinek û girêkek yekser di navbera xwendevan û nivîskarên mezin ku li derwî welat dijîn, wek mamuste (Şahîneh Bekirê Soreklî û Jan Dost û Helîm Yûsiv û Pîr Rustem û Salih Demîcer û hineke din). Dilname bi dil germî û xweşî ji aliyê gelek rewşenbîr û rêxistin û encûmanan de hat pêşwazkirin.

Dilname bi rastî rojnameyek rewşenbîrî ye serbixwe ye, roman, çîrok, helbest, huner, gotaran diafrîne, ew yekeme li hindir welat, ew li ser pelan jî çeleng derdikeve, ne tenê li ser Net, helbet hinek rojnameyên din jî hene, lê ewana girêdayîne bi partiyên siyasî de, wek rojnameya (Deng û Neweroz).

Dilname dide nasîn ku rewşenbîrê kurd kare rolek girîng billîze, ne tenê partiyên siyasî, ev jî gavek girîng û li pêşê di vî warî de.

Roj bi roj xwendevan û nivîskarên Dilname pirdibin, ez jî yek ji wan xwendevananim.

Ez bi hêvîme ku ev rojname û rojnamegirî bi tevde, bi serbestî û azadî were belavkirin û qebûlkirin ji aliyê sûriyê ve. Ez pîroz dikim Dilname ku karibû van pêûsan topke û ji xwendevan re wan li hev bicivîne, û em nameyên dilên wan bixwînin.

BEŞEK JI ROMANA JAN DOST A NÛ

... Dûmahik:

-rex keçeke biyanî rûne. Digotin ku nêr û mêyek li ku hevdû bi tenê bibînim, dê şeytan kesê sêyemîn be di wê civînê de! Çend roj derbas bûn bêyî ku çavên min bi Kewserê bikevin. Min ji xwe re di xeyalê xwe de hevdîtî pêk dianîn. Dawî min biryar da ku çawa wê bibînim dê hestên xwe jêre bibêjim û çawa be ezê di riya wê re xwe fêrî axaftina helebiyan bikim.

Roja heftan dîsa hate xanê! Vê carê bi tenê bû û tûrikek hinne û çend guldestên yasemînan pê re bûn. Min ji çavên xwe bawer nekir û bi lez daketim jêr. Pîr û kalên ermenî, Wanês û Zara xwe dabûn bin siya dareke purteqalê û tirî dixwarin. Xirecira bazirganî bû, hin derdiketin û hin jî ji bajêr dihatin. Ji vir de silavek ji wir de bişirînek heta ez gihame nêzîkî Kewserê. Min xeyal dikir ku her kesên li hewsê xanê dengê gupegupa dilê min dibihîzin û bi raza dilê min dizanin loma jî heta ji min hat min hewl da ku hestên min ên derûnî di rûyê min de nedin der. Bi wê tevliheviya rûhî ez hatim li rex Kewserê rawestiyam. Kirasekî şalê hindî yê şînê ezmanî û gulhûr lê bû. Kirasekî fereh bû ku deşt û newal û evraz û nişûviyên laşê wê veşartibû. Desmaleke etlesê zer î sadereng jî porê wê nuxumandibû, lê tu tiştî nikarîbû awirê wan cavên dirrinde veşêre. Bi fediya aşîqekî rewal û nûhatî ez ber bi wê ve çûm. Heta wê gavê jî ji min re baş ne zelal bû ka hestên min bijandina wê keçîkê ne yan jî evîneke rast in! Ji xwe destpêka her evînekê jî dibijîm e berî ku bibe dilbirijî. Him dilê min dibijiyayê him jî dibirijî. Ez di navbera hestîna dîn de dişewitîm lê cesareta min a ku evîndarî dikare wê bide kesê herî tirsonek jî alîkariya min kir û hema min yekser jêre got:

- Te amo¹.

Tiştê ku ez behitandim ew bû ku Kewserê nebehîti. Ne mîna keçeke nûhatî ku cara yekem gotina cantezîn *Ez ji te hez dikim* dibihîze. Min pêşî texmîn kir ku wê ji min fêrî nekir yan jî nebihîst. Ez hinekî bêdeng mam, mîna nêçîrvanekî di kozîka xwe de û cav li nêçîrê ketiye bê çawa ber bi xefka vedayî de diçe wisa henasqut mam, lê wê, wê nêçîra ku nêçîrvanê xwe da ber tîr û kevanan ez veciniqandim:

- Ti amo anche io².

Bi vê gotina xwe re jî bişirîneke watenenas kişande ser lêvên xwe û awirên xwe ji çavên min nema birrîn. Wê bişirîna şêrîna gelek rezên razên razayî di xeyalê min de şiyar kirin. Ez ji bisirîna wê têgihîştîm ku ev keçîk dê karibe bextewerîya ku ez li pey wê heta van welatan hatime, bike para min. Wisa jî ez ji awirên wê têgihîştîm ku ew dikare jiyana min serobinî hev jî bike û min pêxwas di dojeheke ji stiriyan de bimeşîne. Tirs û şadiyê xwe li hev alandin û bûne hestekî têkel û dilê min dane ber xwe û ew tevizandin.

Ji nişkêve, dengê wê yê nazîk dawî li tevizîna dilê min anî û mîna ku wê xwesteka min xwendibe got:

- Tu bixwazî ezê te fêrî axaftina helebî bikim!

Finasên jinên şerqî seyr in! Gava dilê wan bixwaze dikarin maran bireqisînin, dikarin şêxan ji rê derînin û weliyan bikişînin nav şeqên xwe. Jin li ku bin dikarin mêran bixapînin lê jinên şerqî di vê hunerê de hosta ne. Kewser jî ne bes hosta bû, lê ewê dikaribû dersan bide lîblîs bi xwe jî.

Dema ku Kewserê ji min re qala Pietroyê venedîkî kir ku çawa ew fêrî zimên kiriye, devê min çû pişt guhê min. Bi wê hîleyê bi xwe jî ez ajotibûm dersên xwe.

Wê got ku bav û diya wê kal û pîrek in û kor in, loma jî ez dikarim xwe bi ebayeke jinan rapêçim û bêtîrs dema ku dibe qîçqîça roja nîvro berê xwe bidim mala wan a ku ne dîrî xanê bû. Wisa kes dê bi min nehese. Min jî, minê ku meya awirên wê û bişirîna wê ya watenenas ez serxweş kiribûm bi ya wê kir. Min hîç nepirsî ku ev tevegereke ziyandar e û dikare serê min têde here, min nepirsî ku encama karekî wisa dikare bibe dawî ji jiyana min re, ji xewna bexteweriyê re, dikare bibe kêra ku bexê bexteweriyê pê serjê bibe, ez bi rastî aşîq bûbûm û min nema ber xwe didît.


Roj û dema ku wê ji min re bi nav kiribûn, min li koşeyekî xalî ebayeke reş avêtze ser xwe, ji serî heta binê nigan ez hatime veşartin û min berê xwe da mala wê. Dilê min bi gavên min ên lezok û tirsok re dikire gupîni heta ez gihame ber deriyê mala wê û min du daran lê da.

Wê derî vekir û ez derbas kirim odayekê di dawîya hewşê de.

Dema em derbasî wê odayê bûn û min ew ebaya reş ji ser xwe şeqitand, ez di xwîdanê de mabûm. Wê jî desmala xwe danî û porê wê bi ser navmilên wê de mîna şeveke zivistanê herîkî û got: *Dopo ci si siede*³.

Me dest pê kir em bi îtalî axivîn, lê wê got: wisa tu fêrî ziman nabî, tenê wek ez dibêjim bibêje. Û dest pê kir. Hevoka yekem ku ez fêrî wê bûm jî: *bihibbek mot*⁴.

Roja pêşî, piştî ku ders qediya, Kewserê hat û destên xwe li newqa min grand. Dilê min dikire pirteptir. Devê xwe bi awayekî mişt bijandin nêzî devê min kir û ez maç kirim. Ezê tî, ezê min jin di jiyana xwe de tehm nekiribûn ketim ser singa wê ya esmer û me hevdû li wî xaniyê biçûk gevizand.

¹ *Bi latîni ye yanî: ez ji te hez dikim.*² *Bi îtalî ye yanî: ez jî ji te hez dikim.*³ *Bi îtalî ye yanî: kerem bike rûne.*⁴ *Bi erebî ye: Heta mirinê jî te hez dikim.** *Destûr ji bo kesî tune ye ku vî beşê romana romanivîs Jan Dost biveşîne.***EY NETEWA BINDEST!****Feqîr Ehmed**feqir1@googlemail.com
(Almanya)

Ey netewa bindest û pîr bar giran
Werin bigrin destên hev wekî biran
Her kes diçin hîvê, sitêrkê û deran
Em mane reben, bindest û talan!
Li cîhanê carek tev rabin ser xwe
Bi zanebûn bikin kar û barê xwe
Bidin hev, mil û destan, dil û can
Dijminan zarê derxin ji warê xwe!
Wekî morîyan bikin xebat û lebat
Hemberî dijminan bibin hêz û lat
Tevger da enî, tektîk û pêşva çûn
Ko rizgarkin ji destê dijmin welat!
Ko nekin tektîk, enî û yek destûr
Bindestê dijmin da bibî tar û hûr
Her kes werin li ser te bidin dar
Nema tu netewî û nema bikî kar!
Tu mayê şerpeze, bindest û reben
Mal tunene, ne hêz heye ne dûzen
Rabin ser xwe li cîhanê bide deng
Bi têkoşîn, eme bimrin yan hebûn!
Ey Feqîr no, rabin rista xwe çêkin
Ala rengîn bi ser xwe da li bakin
Di cîhan da, em jî hene yek netew
Bi nûjenî komara xwe peydakin!

ZAROKEK, DÎROKEK Û DU ZIMAN* ... Dûmahîk:

Qedera min jî ew bû, bi hatina mina dinyayê re bibînim ku, ev zimanê tev li birînên xwe yên xedar liberxwe dide, ew ziman bixwe ye, ewê ku diya min, hîna di dergûşê de, ez pê dilorandim.

Em, zarokên wî zimanê birîndarbûyî, dereng be jî, berî mirineke erzan, bi hewara wî ve hatin.

Vaye bi wî zimanî, ez çîroka mirin û jiyana giyanê miletekî ji nişkêve xwe dît ku, bi xiyaneta dîrokeke kor û bi kêrên Cografyayêke sergijik, di nav pençên çar dewletên hov de, hatiye pervekirin, dibêjim.

Ev çîroka ku min vedigerîne ber xefka zarotiya min, bi jêkirina zimanê zarokekî destpêdike û bi çandina zimanekî din di dev de û mejiyekî din di serî de û giyanekî din di laş de, çîrok gewde digre û bi rasthatina li dîwarekî asê ji dîwarên tunebûna derfetên bihevreyanê bidawî dibe.

Ew zarok, dûre dibe nivîskarekî bê dewlet, teyrekî bê bask û du lingên bê erd.

Ew zarokê ku dewlet bi hemû hêz û leşkerên xwe lê civiyabûn, da ku wî lal bikin, ez bûm.

Dewlet bi hemû hêzên xwe yên zuhakinê lalbûn û vaye dara zimanê min kesk dibe.

Qedexekirin lal e, zuha ye, bê wijdan û xav e.

Zimanê her dayikekê, gihayek e, xweşikbûnek e, diyariyêke Xwedê ye ku nikare bê redkirin.

Ew cara yekem bû, ku di şeş saliya xwe de, ew zarok ji malê derdikeve û li dîwarekî asê rast tê. Bavê wî bi destê wî girtibû, birayê wî yê mezin, ji bo wergerê, dabû benda xwe û diçû ber bi kelehên zimanê duyem de. Bavê wî dixwest navê wî di dibistana bajêr de qeyd bike. Ji nişkê ve xwe dît ku li ber karmendekî bi taxime û bi zimanekî ku ténagihêje dipeyive. Wisa birayê wî jî bi heman zimanî bi yê karmend re diaxivî. Wî zarokî dizanibû ku navê wî tê gotin û tiştin li derdora wî diqewimin, lê nizanibû çî tê gotin.

Ew kêlikên ku di mala dewletê de qedandin serî û giyanê wî xistibûn nav veciniqandin û matmayîneke mijokî de. Pê re jî di dilê wî yê biçûk û sade de tiştek dişewitî. Li derdorê jî bêhna mirinekê, pêjna şînekê û dengê çivîkeke kuştî tevlihev dibûn û ber bi ezmên de difûriyan. Ew zarokê şeş salî, yê veciniqî û matmayî ez bûm.

Ew bajar, Amûdê bû.

Ew bêhna ku nayê jibîrkirin, bêhna qedexekirina zimanê dayika min bû.

Ew çivîka kuştî jî, dilê min bû.

Zimanê yekem, zimanê giyan, yê hestan, yê jineke nexweşik û birîndar e.

Zimanê duyem, zimanê dibistan û zanîngehan, yê aqil û mejî ye, yê dewleta xweşik e.

Ew zarokê şeş salî mezin bibû. Di dibistan û zanîngehan de, bi zimanê dewleta xweşik pirtûk, rojname û kovar dixwarin. Di nav salan de çûbû, mûyên sipî hêdî hêdî diketin nav porê dilê wî. Ji bo agir û şewatên canê xwe sivik bike, ber bi rûpelên spî de dibeziya û rûyên wan reş dikirin. Çîrokên zimanê qedexê, evîna qedexê û jiyana qedexê dinîvisandin. Bi hibrekê ku rengê xwe ji reşayîya şevê girtibû, her şev dinîvisand û bi roj jî radiza. Ne hewcedarê ronahiya rojê bû. Xwe dida ber ronahiya agirê ku di giyanê wî de dadayî mabû. Dawiya şeveke zivistanê, xwe li ser erdê dirêjkiribû û dinîvisand. Diya wî di ser serê wî re sekinî û jê pirsî:

-Tu çî dinîvisînî lawo?

Ji nişkê ve naskir ku ew bixwîne jî, wê diya wî nizanibe çî nivîsandiye. Ew cara duyem bû ku di jiyana xwe de vediciniqê û di nav mija matmayîne de dimîne. Bi dilekî şikestî li rûyê diya xwe nerî û ji xwe şermkir.

Di sîhsaliya xwe de naskir ku bi mifteyêke şaş dixwaze deriyê giyanê xwe veke û naskir ku wî ji şeş saliya xwe de ew mifte wendakiriyê.

Mîna zarokekî şeş salî ku diya xwe wendakiribe û ji nû ve bibîne, roja din, ew mêrê şikestî vegeyriya ber destê diya xwe. Mifta deriyê jiyane ji dest wê girt. Destê wê maçkir û bi çavekî, ji qehran re, digiriya û bi çavên din jî, ji kêfan re, dikeniya.

Ew giriyê wî yê dirêj û ew kenê wî yê bilind, bûn tîp, bûn peyv û wisa jî bûn çîrok û roman.

Belê, ew mêrê şikestî yê ku heta niha bi dilê wî zarokê şeş salî dinîvisîne ez im.

Sibe, li heman bajarî û li heman welatê ku ez jê tîm, wê zarokekî din bibe şeş salî. Wê malbata wî jî bixwaze ku biçê bixwîne û mezin bibe.

Wê dîsa zimanê xwe yê birîndar li malê bihêle û bi zimanê mamosteyan veciniqê û di nav mija matmayîne de bimîne.

Tirsa min ew e ku piştî çil salî, kurdekî din bê, li hember we bisekine û ji wer e qala kuştina miroveke bi navê zimanê dê bike.

** Ev nivîs di roja duyem ji Komcivîna Navneteweyî ya Nivîskar, Werger, Weşangeran li herêma Ewropa - Derya Spî de li Stenbol ê di (08.01.2011) an de hate pêşkêşkirin.*

MADEM TU NAXWAZÎ!



Demhat Dêrikî

demhatderiki@hotmail.com

(Duhok)

Min gul nedizîn, di kenên derewîn de neçand û buharên xelkê li ser piştê hespên zivistanê bi şûrê bagerê nekuşt! Min tabloyên dilê dildaran yên vir û wir di meyxanên laşforşiyê de, ji keçkanî nexist û firdana kevokan li asîmanên rûgeşiyê di nexşeya parçekirinê de nefetisand! Min beşrîna dergûşan li ser hestên xwe talan nekir û gora ducaniya di ajoyan de nekola! Na, min guh, poz, temenên buharî li welatê cemedê pêşkêşî sifra gurên birçî nekir! Ew, ne ez im! Ne navê min e! Ez kî me?! Dema roj, ji dil qamên xwe diavêt û kenên zarokan li ser dika gulan stêrkên asîman li dora heyvê geş dikirin û şev li ber awaza çeman diherikî şahiya jivanên zeriyan!..eha ew ez im! Dema ramûsanên dilopên xwehdanê ji eniyan dirêjî xakê dibûn, dil bi zêrgenimî dixemilî û dengê das û tirpanan li ber strana jînê distarandin!..eha ew ez im! Ew ez im, di paxila min de bilbilan destana evîne diyarî ayendeyê dikir! Lê tu, zivîstanxwazî! Madem tu naxwazî buhar, de bila her der bibe tofan, Da jiyana bibe gulbuhar!

KURTEDIROKA ENSTÛTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

Çavkanî: **Miraz Ronî**



DAMEZIRÎN

1- Ramana damezirandina Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ji danezana avakirina Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) derket, ku li heman bajarî di sala 1991'ê de hatibû avakirin. Di danezana NÇM'ê de, warên çalakiyan ên vê saziyê wek huner, çand û zanîst hatibûn amajekirin. Piştî damezirana NÇM'ê, ev her sê beş hatin pêkanîn û bi beşdariyên berfireh dest bi xebatan hatin kirin. Lê belê, bi zêdebûna xebatan, hewcedariyên nû xwe dan xuyakirin. Bi vê yekê re, ramana ku divê beşa zanîstê wek enstîtu xwe bi rê bixe serdest bû. Di pey avakirina NÇM'ê bi qasî (8) mehan bi şûn de, serokê damezirîner ê NÇM'ê İbrahim Gürbüz, ev hizir û ramana xwe ji hevalên xwe yê xebatê yê NÇM'ê re got: "NÇM têrî me nake... Divê em beşa zanîstê ya NÇM'ê wek Enstîtuya Kurdî rêxistî bikin. Êdî pêwîst e ku enstîtuyeye Kurdan jî hebe. NÇM, divê li ser xebatên çand û henerê raweste û bi giranî bala xwe berde ser van waran..." Gürbüz, pişt re ev ramana xwe ji kesatiyên naskirî yê Kurdan wek Feqî Huseyn, Cemşîd Bender, Abdurrahman Durre, Musa Anter û Yaşar Kaya re vekir. Hema bibêje tevan bi kêfxweşî nêzikayî li vê projeyê kirin û dan xuyakirin ku wê piştgirî lê bikin û tê de jî cih bistînin. Di dawiyê de biryara birêxistina vê peşniyazê hate dayîn.

Du gелşên sereke li pêşiya damezirandina enstîtuyê bûn ku divê bihatana çareserkerin; pêkanîna binyata qanûnî ya enstîtuyê û bi awayekî berfireh tevlikirina ronakbîr û lêkolînerên Kurd ku her yek ji wan li deverê welêt bûn. Di destpêkê de biryar hat girtin ku enstîtu di nav çarçoveya peymanê şirketa NÇM'ê de bê çêkirin; xala (39) a şirketê derfet dida vê yekê.

Rewabûna wan li aliyekî, bi awayekî qanûnî ji avakirina yekîneyên lêgerînê, civatên zanîstê û enstîtuyan re wekî din rê tune bû, tenê dikaribû di binyata şirketan de ev tişt çêbibûna. Ji ber ku di mewzûata Wezîriya Perwerdehiya Neteweyî de ji bo enstîtuyan palpişteke qanûnî ya cihê û taybet nîn bû.

Dor hatibû ser kar û xebata avakirina enstîtuyê. Digel mercên zor û dijwar (ku her roj 5 -10 kuştinên kiryar nediyar dihatin kirin, li navrojê li ber çavan bêpîrs û pîrsyar mirov dihatin kuştin, di rûpelên rojnameyan de her roj nûçeya valakirina gundekî nû cih digirt, rewş rewşeke welê bû ku rewşenbîrên me jî bêhizûr dikir), fikra avakirina enstîtuyeye Kurdî helecaneke mezin çêdikir û ev ramana hanê digihîştê ku derê, li wê derê eleqeyeye mezin çêdibû. Dawiya dawîn, di encama dan û standinan de biryar hat girtin ku, ji bo damezirandina enstîtuyê di nav xwe de gotûbêj bikin, civînek bê lidarxistin û rewşenbîr û zanyarên Kurd ên li derî Stenbolê jî beşdarî lê bikin.

2- Organîzasyona civîna li Rojda Restorantê, ku roja (5'ê Adara 1992'yan) li Etîlera Stenbolê pêk hatibû, İbrahim Gürbüz û Feqî Huseyn Sağnıç girtibû ser xwe, lê gelek endamên desteya rêveberiya NÇM'ê û xebatkarên wê jî bi awayekî çalak di nav xebatê de cih girtibûn.

Serokê NÇM'ê İbrahim Gürbüz axaftina vekirina vê civînê kir, ku bi qandî (40) rewşenbîr, nivîskar û zanyar ji cihên cuda yê Tirkîyeyê hatibûn û tevî wê bûbûn. Gürbüz hewcetiya enstîtuyekê destnîşan kir û pêşniyaz kir ku desteya damezirîneran bê sazkerin. Piştî axaftina vekirînê ji bo ku civînê bi rê ve bibe, Yaşar Kaya wek serokê danîşînê hat hilbijartin. Beşdar gengeşî û nîqaşeke têr û berdard pêk anîn. Li vir daxwazaka ku divê enstîtu di bin bane zanîngehekê de bê çêkirin jî hate kirin; lê belê (bi taybetî li ser gotinên İsmail Beşikçi ku dida xuyakirin îmkaneke wiha di sistema unîversîteyan de nîn e), li ser fikra ku divê enstîtu serbixwe be lihevhatinek çêbû.

Di doman û pêvajoya damezirîna Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de, ev xwarina li Rojda Restorantê ku di (5'ê Adara 1992'yan) de pêk hatibû, xwedî girîngiyeye dîrokî ye. Li jorê serokê damezirîner ê NÇM'ê İbrahim Gürbüz gotarek pêşkêşî vexwendiyar dike.

Di encama civînê de, bi tevahiya dangan ji bo desteya damezirîneran ku ji (8) kesan dihate pê İsmail Beşikçi, Musa Anter, İbrahim Gürbüz, Feqî Huseyn Sağnıç, Yaşar Kaya, Abdurrahman Durre, Cemşîd Bender û Suleyman İmamoğlu hatin hilbijartin. Dîsa bi tevahiyan dangan İsmail Beşikçi - ligel ku ji vê yekê re ne xwezayî bû - wek serokê desteya damezirîneran hat bijartin.

Edî dest pê hatibû kirin, digel ku derfet jî pîr kêmbûn, li Nîşantaşîya Stenbolê li ser 'Rumeli Caddesi'yê daîreyek hate kirêkirin. Ji bo roja vekirînê jî, (18'e Avrêla 1992'yan) hatibû kifşkirin. Hem ji kesên li derve û hem jî yê li hundir re, bi sedan vexwendname hatin şandin.

Di pey keft û lefteke giran û fedakarane de, piştî ku desteya damezirîneran xuya bûbû, bi meh û nîvekê hemû amadehiyên ji bo vekirînê tamam bûbûn. (Reşemî 1992-Avrêl 1992).



3- VEBÛN

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, roja (18'ê Avrêla 1992'yan), sa'et di (13.30'yî) de vebû. Merasîma vekirînê, ligel girseyeke boş û vexwendiyên ku hin jê ji derveyî welêt hatibûn gazîkirin wek Prof. İsmet Şerîf Wanlî, Prof. Celîlê Celîl, Prof. Ordîxanê Celîl û Mustafa Reşîd; parlamenter Hatip Dicle, Ahmet Türk, Ali Yiğit, Abdulmelik Fırat û Serokê Giştî yê Partiya Keda Gel (HEP) Feridun Yazar hate kirin. Di pey axaftina vekirînê ya Serokê NÇM'ê İbrahim Gürbüz de, Serokê Desteya Damezirîneran İsmail Beşikçi axaftinek kir. Piştî van, ji endamên desteya damezirîneran Feqî Huseyn Sağnıç, Musa Anter, Yaşar Kaya û Cemşîd Bender, ji vexwendiyar jî Prof. İsmet Şerîf Wanlî, Prof. Celîlê Celîl, Prof. Ordîxanê Celîl û Mustafa Reşîd mafê axaftinê girtin, hest û desteka xwe ya ji bo enstîtuyê derbirin. Di vê navê de, mebesta enstîtuyê ya ku "enstîtu dê di warê ziman, dîrok, wêje, etnografyayê û hunerê de, bi giştî di warê çanda Kurdî û mîrasa sosyolojîk de lêkolîn û lêgerînan bike", bi daxuyaniyekê hate aşkerakirin; her wiha hate gotin ku li ser van esasan dê bi saziyên derve û hundir re têkilî û danûstendin bîn pêkanîn. (18 Avrêl 1992).

ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN

Roman - Xelek (3) ©

Pîr RUSTEM

pir1963@gmail.com

(E'frîn)



- Tu çima dixwezî dijmantiyekê têxe navbera me.
- Ez..!
- Belê, ev bû çend carin tu evê pirsê dikî û min gote te ku, ez wî nas nakim, ti tişt di navbera me de tine ye, vêca tu çima pirsaxwe dubare dikî. Agob têghêşt eger ku hinekî din pêde biçê, dê têkeve rewşeke tehil, lewre bi nermî jê dipirse: Tu ji zûde bi ser zarên xwe de çûye. Kalemêr tenegehêşt ka ew çî dixwez e, lê gotina; "zarên te" dihêle ew bikene û berve oda Koçer binire.
- Zarên min, kê gote te zarên min hene.
- Dîsa jî ji bilî xwe çêtirin, te yên xelkê nedîtine.
- Li ser çî, ev bû deh salên min in ku ez li ba we me, te ew carekê jî li vir dîtine. Eger ku kerekî yekî hebe û pîr bibe dîsa jî ew wî navêje û her çendekî bi ser wî dikeve, ka çî bi wî hatiye.
- Tu çima rindiyên wan winda dikî; her meh ew mizaxa te dişînin û ... Kenê Kalemêr gotinên wî dibire.
- Belê, tu diçî û ew pariyeye nan davêjin pêşiya te û çend sêxuran ji min re jî dişînin.
- Na, îro axaftin bi te re zore.
- Çima tu ji rastiye direvî, ma ne wilo ye. Agob dizane ku rastî di gotina wî de heye, lê naxwezê nas bike. Piştî evqas ked, tuyî dibînî.
- Loma ji wan neke, ew nikarin dev ji karên xwe berdin û bên li ber pozê te rûnin.
- Agobê min, qet di ber dilê min re neçe û neyê; ez ne zarome, piştî evî temenî, yek dikare tayê reş û sipî ji hevdu derîne, bes ji bîr neke ku, çawa seriyê min li keviya îşkê xistin dê rojekê bê û zarên wan jî ê bi lingên wan bigrin û di cihê ku ez têre xuşandime, ew jî yê bêtin xuşandin.
- Çêtire ku yek bi xortanî ji evê dinê barke. Kalemêr berkenî dibe; ewî naskir ku, Agob bi veşartî dêv davêje pîreka xwe.
- Bes ji bîr neke ku, dar bi berê xwe şêrîn e, lê xûya ye berê me tehle, gereke ji zû de ev dar bihata birîn, lê wer dixûye ku xwediyê wê merivekî bê kêre.
- Te dest bi kifriyan kir.
- Gotinên pir bide aliyekî, tu çî dibêjî ku, em îro bi hev re piyalekê hildin.
- Bes di kalbûna şevê de; tu dizanî ku ez naxwezim cîran ji me aciz bibin.
- Cîran an Marî. Kalemêr dibêje û ji berî ku, ew kenê xwe bi dawî bîne, Agob derdikeve; tu çima çû, çêroka pîrê li dilê te nexweş hat .. ev kuve çû. Lê gava xuşînî ji nav beştên ban tê, bîr dibe ku marê reş di wir de cih girtî, ber bi wir ve dinire dibîne ku, pilindirê wî jî ji nuh ve veşariye û konkê xwe di quncê berê de ristiye. Radibe û ber bi ewî quncî ve diçe: Tu yî mezin bûyî, di evê windabûnê de te kî daqirtandî .. belê ez dizanim ku, dora min jî nêzik bûye. Dema bastûn ber bi ewî ve têve dide, ew xwe di nav beştên ban de vedîşêre.

- 2 -

- "Ez bi ku ketime; ev cara yekemîne ku, evê derê dibînim û ka kê ez anîm û kengî û ji bo çî û çima". Pir pirs di seriyê wî de digerin, lê bi qasî ku li rê heyriye, li ewan pirsan napirse. -

-Her ku ew ber bi pêş ve dimeşe, rêka ku ketibû ser de li wî teng dibe; pêkinên daran ketine nav hev de, dighe ku ew rê li pêş bigrin û dema bihin li wî teng dibe, bizavên xwe dike, da ku, xwe ji kemenda daran derîne, lê ew hatiye girêdan û ji nişkave lingên wî ji erdê têne birîn û ber bi jor ve hildikêşe, ew dibe bazek û bi ezmên de difre û di bin re çiyayekî fireh û bilinde, deryayeke sinkayiyê ye.

Di gera xwe de dighe jorî gundkavilekî; malin ji tozê û di beyareke zer û ziwa de hatine fetsandin, ne ban û ne jî dîwar, titişt li ser hev nemaye. Ew hîne difrî, dengê keçekê bi ber guhên wî dikeve, dihêle dakeve û di zikakeke gund de rastî perwîneke buhiştê bibe. Ji berî ku, ew ti tiştî jê fêm bike, dinire ku komeke leşker dane dû wê û bi bazdan di wan zikakan re direvin. Koçer dike-nake ku karibe careke din bifre, lê bizavên wî bê sûde der dikevin û gava ti çare nedîtî, destê wê berdide û jê dixweze ku, ew xwe di deverekê de veşêre, da ku ew karibe rêya leşkeran ji ser wê bişkîne û wê ji pêşiya serbazê leşkeran birevîne; bi hêştina ku bihêle leşker bidin dû wî bi tenê.

Piştî ku Koçerê Başûrî xwe ji pêş wan winda dike, vedigere cihê ku keçik lê hêştibû, lê ew bûbû pariyeye nan û winda bibû, çiqas rêk û quncikên wê derê hebûn giş tevdan, lê bêyî ku rastî wê bê û hîne ew di ewê sergêjiyê de bû navê xwe dibîse.

- Koçer.. Koçer, te xewkirî. Agob, serî di derî re dirêj dike; ev bûn çend deng ez li te dikim.

- Keremke. Bi gotinê re ji ser têxt dadikeve.

- Sipas, xortek li ber deriye, ew li te dipirse. Agob ji nuh ve serî dikêşîne.

- "Kiyê evê ku, cihê min naskiriye". Bûbû du mehên wî ku, ev ode girtî û hîne ti kesî cihê wî nedîtibû. Dema deriyê zikakê vedike, dibîne ku Kamîranê Hemo bê aramî li hêviya wî rawestiya ye.

- Êvar baş, tu razî dibî ku em hinekî bi hev re rûnin.

- Tu nabînî ku tu xwîna xwe giran dikî, dê derbas be û gotinên boş berde. Bes te ji kuve cihê min naskir. Piştî ku ew dikevin hundir Koçer dipirse.

- Eger ku yek bixweze, dê bighe "Odeya helbestvan". Ez dikarim bibêjim ku, eve dawiya xewnên te.

- Ji berî her tiştî dawiya xewnan tineye û eger ku, bes dawiya wan heba dê ne xewn bana û nuha ka rûne û di piş re dest bi tinazyên xwe bike. Koçer bi gotinên xwe re wan çend pirtûkên ku, li ser text belavkirî kom ser hev dike.

- Tenhayî dihêle yek bibe feylesof..., biner ez gelkî namînim, tu bi çî dikenî. Dema ku dibîne Koçer ber kenî dibe, ew jê dipirse.

- Ez dikenim ku, kengî we bibîne hûn bilezin û ez nizanim çima heya bi nuha me gavek bi pêş ve ne avêtî.

- Tu dizanî çima çavên dewê, demên ku ewî dixînin delûbê yan jî cercerê, girêdidn; beza me jî wek ewê bezê ye. Koçer berkenî dibe, dinire ku dostê wî hîne weke berê maye; ew serast ber bi tiştê ku dixweze diçe, nikare tiştan bincil bike.

- Ji berî her tiştî, tu yê çî vexî.

- Çayê yan jî çayê..., lê çayê.. Kamîran vedigerîne û diranên ku, ji cixaran reş bûne xûya dibin. Ka were rûne, ti tişt negereke.

- Çê nabe, ev cara pêşiya ku tu tê ba min. Ew radibe ser xwe û bi boneya hatina wî dixweze çayake nuh çêbike; ewa ku ji berî du rojan dirjîne û her tiştî bi hev re dixwe çaydên, datîne ser papora gazê û ji nuh ve vedigerê ser danîştoka bi tenê.

- Ji berî her tiştî rewşa te li ber çava ye û pirsê naxweze. Mîna ku min ji berî kêlikê jî gotibû: Te ev rewş dixwest, bi tenê û çend pirtûk, maseyek û ...- ... **Dûmahîk Rûpel: 13**

ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:

-em kemancê jî ji bîr nekin.
 - Tu çêrokê ji min çêtir dizanî, vêca çima tu dixwezî bibêjî ku, ew rewşa han xwesteka min bû.
 - Ne ku ji ber dizanim, ez vê gotinê dibêjim, nuha ez nehatime ku em defterên kevin vekin; bi kurtî, hevalan ez şandime da ku, tu vegeŕî ser karê xwe.
 - Bes tu dizanî ...
 - Bihêle ez gotina xwe bi serî bikim û di pişt re tu çî dixwezî, tu dikarî bibêjî. Weke min got; hevalan ji min xwest ku, ez te bibînim.
 - Tu çawa dibînî.
 - Ez vê yekê ji xwe re dihêlim û dive tu ji bîr nekî ku, ez hevlekî partî me. Ez dibêjim ku çaya te baş keliye. Bi dawiya gotinê re ew radibe ser xwe û gava ber bi pencerê diçe, çavên wî bi Şêrînê dikevin, dinire ku çavên wê li pencera odeya Koçer e. Xûya ye ku te guleke nuh di gulîstana xwe de çandî. Koçer gotina wî, di cih de, fêhm nekir, lê dema dibîne ku ew ber bi oda jor ve dinire, hinekî riwê wî sor dibe.
 - Tu digel ramanên xwe dûr neçî. Piyala çayê ber bi wî dirêj dike.
 - Cîranên te çawa ne; ez ne di wê baweriyê de me ku, tu karibî di vir de kemancê têxî destên xwe. Li Koçer dizivire dinire ku, ewî serî xistiye ber xwe de. Hîne ji bersivê re zû ye, ezê nuha biçim û piştî sê rojên din vedigerim, tu dikarî wê hîngê nirîna xwe bidî.
 - Çima wilo bi lezî, ka rûne; ez dixwezim em hinekî bi hev re bimînin. Ew nirîneke dilovan li hevalê zaroktiyê dike.
 - Bihêle cara bê û niha bi xatirê te. Ji berî ku Koçer karibe, careke din, jê bixweze ku bi hevra bimînin, ew ji odê bi derdikeve û ji derva de deng lê dike û dibêje: Kevok hîne nefiriye, tu dikarî nêçîriya wê bikî.
 - Piştî çûyîna Kamîranê Hemo, ew odê gelekî fireh dibîne. Radibe ser xwe û çend caran ji aliyekî dîwêr diçe yê din, li ber pencerê radiweste û ber bi oda wê de dinire; "kevok firiye". Ji nih ve xwe li ser têxt dirêj dike û meşa xwe ya vê sibê bi Şêrînê re bi bîr tîne, lê axaftina wî ya bi Kamîrên re wî ji xewnerojan didize. "Careke din vegeŕim kar.. erê, bes kiyê vegere; Koçerê ku ro li şevê dixistin mir û têr mirin bûye".
 - Tê bîra wî roja ku, hevlekî kevin tê cem û dibêjêyê: "navê te hat û ji îro û pêve tu hevlekî meye". Evê yekê hêştibû ku, xew ji çavên wî bireve û heya ber destê sibê bi xwe re têkeve axaftineke dûrdirêj; dê çawa derbasî civînê bibe û wî pir tişt di jiyana millet û welêt de guhartin. Ji berî ew hevalê ku, mizgînî jê re anîbû here, ew sozekê didin hev, da ku hevdu piştî sê rojan bibînin. Koçer bawer nedikir ku, dem dikare evqasî xwe ji hevdu vezîline, lê ev sê rojên ji berî soza wan bi wî dane nasîn ku, carna rojek dikare şûna jiyanêke bi saxî bigire û piştî ew sê rojên dirêj derbas dibin, ew li ser soza xwe tîn dîtin.
 - Mixabin.. , bibore. Ez hinekî dereng mam, ne. Bi dirêjkirina dêst re, wî gote Koçer.
 - Ne xeme, carna yek ne bi destê xwe ye.
 - De keremke. Ew berê xwe didin geraca otombêlên diçin "Bajarê Mezin" û di navbera çend kêliyan de dikevin ser rê û gava hevalê pêre deng li wî dike, Koçer ji ramanên xwe tête birîn.
 - Tu bi çî diramî.
 - Bi xweşbûna xuristê... Ew bi kurtî vedigerîne, daxwaza Koçer ewbû ku, wî digel xewn û temaşekirna rê, çiya, newal û darên zêtûnê bihêle û dema ku, ew digihên çaterêya "Kefir Cenê" û ji berî her tiştî çavên wan li "Miesker Telai" dikevin ku, bi kon û avahiyên xwe ve, ew di nav ewan darên çiyayî de hatiye çikandin.

- Her ku, ez dighême evê derê baweriyaya min bilintir dibe ku, em miletekî korin. Bêyî ku ew çavên xwe ji ewî çiyayî bibire, Koçer dibêje.
 - Çima.
 - Bi dîtina evî cihî di nav çav û çiyayên me de.
 - Ev yeke bi çûke, eger ku karibin dê me tevan ji herême derînin û li şûna me Ereban bi cih bikin.
 - Kê gote te ku wilo nakin; ma "Kembera Erebi" çî ye. Ji berî ku, ew dawiya axaftina xwe bîne, Koçer rê li ber dibire.
 - Belê, bes ew di demeke dîtir de bû. Koçer dinire ku, ew cihê xwe xweşdike û carekê - dudiyar, dêst di ser zikê xwe yê bilin re dixuşîne, bêyî ku hest bibe wî çiqasî cih û hilim lê teng kirî.
 - Erê roja îro ew dem çûye, nema dikarin bi wan şeweyên serest derbasî herême bibin, bes wek em dibînin ku pir rê û şeweyên din hene û ewana hinek jî bi kar anîne, çî ji guhartina navên gundan û anîna malên Erebi û bi cihkirina wan. Bi belavkirina erdên "Îslah Zîraî", nema ew ji vir diçin, ew bi pozbilindî dibêje Koçer.
 - Bes ji bîr neke ku ew ne ji ber xwe hatin; axayên me ew anîn.
 - Raste, lê gava ku erd belav kirin, ên Erebi bûn xudiyên zevî û daran û li nik wan jî cotariyên Kurd; xudiyên rasteqîn, bê par man.
 - Belkî tu negihêştê, lê gava belavkirina erdan ezî xort bûm; ji berî wê dîrokê tenê çend malên Ereban hebûn, lê gava dest bi belavkirinê bû, karwanên wan bi ser herême de anîn. Ji berî ku gotinê bi serî bike, du cixareyan ji beriya xwe dikşîne.
 - Heya wê hîngê ew dighên çaterêya Dêrcimêlê û nobedariya polîs dêst ji wan re hildide û ji berî ku, ajovan dakeve, kesek ji bînekan û bi dengê bilind dibêjêyê: Bîst û pênc diravan têxe nav kerta otombêlê û çûyîna te ya cem wan negereke, ewê bi xwe bîne û temenan ji te re lêxin. Ev yeka dibe keysek ku bînek hinekî bi hev re bi axifin, lê bavê Memo û bêyî ku, weke her car xwe têxe nav wê danûstandinê de, vedigere ser babeta ku bi Koçer re vekiribû: Weke ku min ji berî çikê gotibû; ez gihîştim ser ewan bûyeran, ez dibêjim belkî tu Elî Kireyem nas dikî. Bêyî ku rê bide Koçer û ew bi erê ya jî na bersiva wî bide, ew axaftina xwe dajo: Ji berî ku ew di Efirînê de bibe berpirsyarê Partiya Bes, ew hevalê Nasiriyar bû û Erebi Efirînê tev wilo bûn, heya parek mezin ji yê Sûriyê jî, eger ku em nebêjin giş, ew di navbera du pêlan de dimeşyan; hinek hevalên Ebdulnasir bûn û hin jî hevalên "Îxwan Mislimûn" bûn, lê dema wan dît ku "Partiya Bes" hate ser hukim, bi zirba ketin nav wê û evê ku min gotibû jî yekî ji wan e û ewî, di belavkirina erdan de, roleke mezin lîst; ewî kesî, Erebi bi şev ji dora "Bajarê Mezin" tanîn û bi roj jî ew dibûn hemwelatiyên Efirînê û erd û zeviyên zêtûnan li wan belvdikirin.
 - Ma ne Besiyên Kurd jî hebûn. Koçer dizane ku pirs wî gevşe, lê ew dixweze wî hevalî bikole û nirîna wî nas bike û ji aliyê din ve jî, dive ew jî gotinekê bibêje.
 - Em Kurd, hertim hilgirê barê bilî xwe ne, ji roja Selehdîn de û hîne ji berî wî jî, eger ku weke me ji xeynî xwe re kirî, me ji xwe re kiriba, nuha em jî xwedî dewlet bana û erê bapîrên me gotine: Eger ku kurmî darê ne ji darê be, dar nakeve û di yeke din de ew dibêjin: Kurd hertim dijminê canê hevîn, lê dîsan jî gereke em ranewestin û divê em evan pendan biguhêrin. Min seriyê te bi van çêrokan eşand.
 - Na; ez dixwezim hinekî ji nezaniya xwe bi dîrkevîm. Koçer bi riwekî êjdil, lê vegeŕand.
 - Rê li pêş te vekiriyê û ji îro û pêve tu yê pir caran axaftinên wilo bibîse, heya verişiya te bê. Rast tu û kemancê çawa ne, weke min bihistî meraqa te li ser mûzîkê pire. Pirsaw dawî hêşt ku, Koçer hinekî sorûmor bibe û bi fedî vegeŕîne.
 - Carina ez wê dixim destê xwe û- ... Dûmahîk Rûpel: 14

ZAROTIYA NEYNIKEKÊ Û TIŞTIN DIN ... Dûmahîk:

dikim ting - rîng.

- Ya baş ewe ku, tu dersan li ser bigrî, ma saleke te, ku tu bê Bajarê Mezin. Koçer şagirtê bekeloriya ye û salek jê re ma bû ku, here di zanîngeha bajêr de bixwîne.

- Ji berî her tiştî dive ez îsal bi ser kevim.

- "Bi sebrê yek dibe mîrê Misirê". Heya wê hîngê ew dighên taxa Eşrefiyê û bavê Memo ji ajoinan dixweze ku, wan peya bike. Dema dadikevin, Koçerê Başûrî heya bi demekê nikare li ser lingê tevîzî bimeşe, wî hêdî - hêdî dabû dû bavê Memo.

Ev cara pêşiyê ku derbasî nav evî aliyê jibîrkirî, ji bajêr, dibe; ew ji her tiştî bê parin, ne rîyên ziftkirî, bê av û kerîz, bê dibistan... bê nan, jîneke reş ku, bi tozê hatiye şûştin, derbas dikan. Ew li ber deriyekî, ji ewan malên ku, bi hevdu hatine hilpesartin, radiwestin û piştî pistekê, xortekî di temenê Koçer de derî vedike û ji wan dixweze ew derbas bin.

- Em tirsyan ku tiştek çêbûbe. Xort dibêje bavê Memo û rê dide wî, da ku, têkeve hundirê odê û dema ew derbas dibin Koçer dinire ku, komeke xort ji pêşiya wan radibe û piştî li dem û rewşên hevdu dipirsin, bavê Memo wan bi hev dide naskirin û dixweze dêst bi karên xwe bikin.

- Emê îro kar û barên we bidin naskirin, da ku, her hevaley berpirsiyariya xwe binase. Piştî ku bavê Memo çend hilman ji cixarê dikşîne û nirînên xwe li wan belav dike, dibêje, lê di cih de xortek lê vedigerîne.

- Me ji berî anuha hilpesarên xwe naskirin û ez dibêjim: Ne gereke ku em careke din li vê movikê vegezin. Ewê rûtirş ku bavê Memo ew bi navê Kamîrî Hemo dabû nasîn dibêje.

- Belê me kar belav kiribû, lê ji bîr neke ku hevaleyê nuh tevî we bû û dive ew jî nirîna xwe bide. Bavê Memo rê li ber wî xortî digre û rîyeke nakokiyê di navbera wî û Koçer de vedike. Ew bê bawerî seriyê xwe dihejîne û dêst bi bijartina berpirsiyariya şana ku, nuh ava dibe dikan. Ew weke berê dimînin û Kamîran, ji nuh ve, dibe berpirsiyarê şanê. Dema ku ew raporta rêxirawî dinivîsîne, Koçer dinire ku ewî gelek şaşiyên zimên xistinê de, lê wî nexwest di rûniştina xwe ya pêşîn de Kamîrî bi êşîne û du keviran di yek civînê de li wî bide. Civîna wan nêzikî çar katan dirêj dike, ji rewşa rêzanî ve ketinê; çî ya hundir û derve, heya dighên a mewdanî û bêlikirina dem û cihê soza bê jî datînin, piştî ku di rewşa civakî û rewşenbîrî re derbas dibin. Di destpêka rûniştinê de ew bi ferehî li ser movikan radiwestin, lê piştî demekê û bi dagirtina odê bi duyê cixaran, her yekî dixwest bi lez tiştên li ba wî heye bibêje û barê ser piştî xwe dîne.

Li ser rîya vegeze, wî her tiştên ku îro pêre derbasbûn bi bîr tanîn û nemaze tiştên ku, di civînê de çêbûbûn. Koçer dixwest ku, bavê Memo pê re vegere, da ku, karibin hinekî bi hev re bi axvin, lê mixabin piştî ku ji civînê derketin, wî jê re got: Tu yê bi tenê vegeze, hinek karên min hene. Wan ji zû de bi Koçer dabû naskirin ku, çî akama evê hevokê heye.

Gava ew nêzikî li Dêrcimêlê dikan, careke din, gotin tê ser xwarina polîsan, dihêlin ew berkenî bibe û bavê Memo tê bîra wî; ew di civînê de yekî din bû, ne ewê ku Koçer naskiribû, wî serast gotinên xwe nedigotin, pir di dora bûyerê re digerî û mîna ewê ku, dest di dora seriyê xwe re gerandibû, da ku, nîşana guhê xwe bide, dikir. Di vir de Koçer kesereke kûr dikşîne; "tîrsa min ewe ku, xewnên me dizîbin".

- Çî ji te dizîne. Pîrsa ewî kesê ku, di nik de rûniştibû, wî vediciniqîne û bi çavekî niv vemirtî ku, yek kolên tirsê tede vebûne, li wî dinire. Dema ew destê xwe datîne ser milên Koçer û pê dide naskirin ku; ew berketiyê wî ye, Koçer tédighe ku pîrsa çûye jê re bû. Axaftina wî ya bilind, bi xwe re, hêştibû ew wê pîrsê jê bike, lê gava dibîne ku, bêyî bersiva wî bide, ew seriyê xwe bi aliyê din de diguhêre, dev jê berdide û babeteke din bi yê pêşiya xwe re vedike.

Koçer bihn tengiyekê di axaftina wan de dibîne; wan dixwestin, bi çî rengî be, rawestandina demê bişkînin.

- 3 -

Dengê derî û hatina Şêrîne ya hundir, ewî heya bi demekê li ser têtê bê liv û vemirtî dihêle; ne dizane ku çêrokeke cinan dijî û Şêrîne mîna keçikên pêriyan postikê xwe avêtiye û li wî bûye mêvan, ne jî xewneke sare.

- Şev baş, ez dikarim derbas bibim. Piştî kêlikê ji rawestina di derî de û bi dengê perçiqandî dipirse, dihêle ku Koçer bêtir di cih de biçê xwar. Lê dema dibîne ku, ew dike ji nuh ve vegere oda xwe, tédighe ku keça cîrana ye û ne xewneke cina ye.

- Keremke, tu çima derbas nabî. Bi gotinê re ew radibe ser xwe û gava li çavên wê dinire û golên fedîbûnê tede dibîne, dinase ku bi tena şort li pêşiya wê maye û bi wê tégihêştinê re radihêje fanêlê xwe û laşê tazî ji pêş çavên birçî vedişêre. Bibore min xwe ji bîr kir. Heya ewê gavê Şêrîn dighe nik masê û danîştokê ji xwe re dikşîne. Piştî ku ew bi cih dibe, çavan li hundir digerîne. Ev cara pêşiyê ku tu derbas hundir dibe, ne? Bêyî ku ew çavan ji kemancê bibire serî dihejîne. Te çawa dît. Koçer, ji van liv û pîrsên xwe, bi kêmaniyeke sar hest dibe.

- Ev kiye..., bavê te ye. Dema Koçer dibîne ku, wê tiliya xwe ber bi wêneya Begenî dirêj kirî, kenekî riswa bi wî digre û dihêle ku, keçik di pêleke xwêdanê de bête şûştin.

- Bavê min..., na. Dev ji ewê yekê berde. Dema sîbera pîrseke nuh, li ser lèvên wê, dibîne dibêjêyê: De ka bêje tu çawa yî û çawa razîbûn ku, tu bê cem min. Ji berî demekê, diya Şêrîne jê re gotibû: Eger dikare û derfet heye, ew hinek dersan bide keça wan. Lê wî di wê hîngê de, ew gotin, nekîr bala xwe. Pîrsên wî dihêlin Şêrîn bi fedîbûna keçikên ku, nuh vedibin, serî têxe ber xwe û di cih de pirtûka metmetîkê ber bi wî dirêj bike. A.. min niha fêmkir, bes kê gote te ku ez bi evan meseleyan fêmdikim.

- Te ji bîr kir ku vê sibê te gote min; ez xwendekarê zanîngehê me. Wê, hêdî - hêdî, rihetiya xwe distand û serast li wî dinire. Meşa evê sibê rê dida wê ku, wî mîna dostekî xwe bibîne û gava wê dest dirêj ser masê kir û xwest li cildê pirtûka ku, li ser danîbûn binire, dolemeya wê heya bi jorî kaboka gilover û sibehî dikşe û xala ku, di nav ewrekî sipî de danîne, bala wî dikşîne û dema Şêrîn dibîne ku, çavên wî dixwezî bi kûranîye de biçin, bi keviya dolemê digre û renewal li pêş wî digre. Rast ewê li cem te kî bû. Piştî bê dengiyê giran û bihin teng, keçik, dipirse.

- Dostekî kevine. Koçer ber bi refika textî diçe û kasêtekê dixê hundir tomargehê. Dema ku Şêrîn hinekî jê dibhîse, bi dudilî dipirse.

- Kiye evê distirê. Pîrsa wê dihêle ku, Koçer hinekî bikene, lê dema dibîne ku, keçik li ber xwe ket, ew kenê xwe dibire û bi rewşa xwe dirame; çima ez wilo dikim, ne gunehê wê ye eger ku, bi Cîwên nebhîstibe". Û pîrsa wê ya di dû re ka; ew bi çî zimanî distirê, bi wî dide nasîn ku, ew gihîştine çî radeyê.

- Bi kurmançiyê. Koçer xwest lîstika ku, wî dest pê kiribû, bighîne dawiyê; Sitrana tu dibhîsî bi navê "Sîh û Sê Gule" ye, ya helbestvan Ehmed Arif e. Gava ku Koçer pîrsa netégihêştina gotinan, di çavên wê de, dibîne, di cih de radiweste û li xwe vedigere; "Ez çî kesekî hêçim, ka ez jê re çêroka stranê jî bêjim û ji bo çî, kê ev kar ji te xwestî".

- Çima te bi serî nekîr. Dema wê dît ku bédengiya wî dirêj kir, deng lê dike û dixweze dawiya çêrokê bibîse.

- Ez dibêjim: Ev ne dema çêroka ye, tu ji bo tiştêkî din hatiye. Kişandina hilmeke cixarê, ya ku di nav tiliyên xwe de ji bîrkiribû, gotinên wî dibire; dê rojekê bê û tu yê çêrokê ji min bibhîsî, ka bi min re rahêje masê;-


... (Berdewamî Heye) ...

NIVÎSANDIN A GOTARÊ*

Xiyas Husên

dillehii@yahoo.com

(Kobanî)



Bi çi hawî em dikarin gotarekê di demek kurt de binivîsin? Dema em vedigerin lêkolîn û ezmûn ên nûdem mirov dibîne ku şêweyekî taybet heye. Ji ezmûn ên herî giring "Ezmûn a Ziman ê Ingilîzî" an jî "TOEFL" cihekî navdar digire. Di vê kurte - nivîsê de dexwazim bi kurtasî şêwe yê herî nû di nivîsandin a gotaran de diyar bikim.

Rengê Gotar a Baş:

Naverok a gotarê xweşik eşkere dike.

Ramanek sereke ya zelal çêdike.

Mînak û hûragahî yên levhatî ji bo alîgirî ya wê ramanê dihêne.

Raman û hûragahî û mînanan li pey hev saz dike bi rengekî lojîkî.

Rêziman a rast bikardihêne û peyv ên rêkeftî bi-cî-bike.

Pir şêwe û reng ên hevokan û peyvyan peyda dike.

Gav ên Sereke yên Nivîsandinê:

1. Pîlandanîn (ramanekê bibijêre, nivîsandin a azad (mejî-tevdan) bikarbihêne, gotar a xwe biêxe nexşekêşekê.

2. Nivîsandin

3. Ve-xwendin (dîsa bixwîne bo şaşî yên rêziman û bijartin a peyvyan).

1-Afirandin a Gotarek Xurt:

Pîlandanîn parçeyekî giring e ji nivîsîn a baş. Kar ê berî Nivîsandinê sê beş in: Raman a sereke, û nivîsandin a azad (mejî-tevdan) ji bo hûragahî yên alîgir, û çêkirin a nexşekêşek bingehîn ji wê nivîsandinê re.

Raman a sereke (thesis) pêwîst e ku:

Ji xwendevan re bibêje mijar a te çi ye.

Bihêle xwendevan hest û bawerî yên te yên derbar ê mijarê nasbike.

Zimanekî zelal û diyar bikarbihêne.

2-Mejî-tevdan (Brainstorm):

Tu dikanî mejî yê xwe tevbidî yan ramanan bihêvojî bo alîgirî ya raman a sereke bikî.

Kaxetekê bikarbihêne bo rêzkirin a hokar (hiccet) û mînak û hûragahîyan. Mejî-tevdan bi navê [Nivîsandin a Azad] jî dihête naskirin. Di vê teknîkê de çi dihête bîr a te tu dinivîsî. Mejî-tevdanê wusa bikarbihêne:

Bê rawestan binivîse.

Dest ên te pêwîst e nesekinin, ji ber ku raman ji wan lezgiñtir in.

Çendî raman pir binivîsîne.

Şaştiyan serrast neke.

Çi hat bal a te binivîse.

Çi raman ên xurt li gor mijarê hebin deyne.

Ji bo rêziman û bingeh a hevokan xeman nexwe.

Heger tu bixwazî, tu dikanî agahî yên xwe bi zimanekî din binivîsî ...

Lê li dawiyê pêwîst e ku tu bi Kurdî deynî.

3-Durustkirin a Nexşekêşê:

Alîkarîyê dike di: Rêzkirin a ramanan bi rengekî lojîkî, û te haydar dike bo valahî yên di mînak ên alîgir de ji bo tu wan dagirî. Bi giştî, gotar wuha sê beran werdigire:

A- Destpêk: Raman a sereke diyar dike.

B- Gewd (numayîş): Alîgir û şirove ye bo raman a sereke.

C- Dawî (encam): Raman a sereke vedibêje.

Nexşekêş raman ên alîgir organîze dike bi rê ya zêdekirin a pêwîstiyê. Hokar ên ku raman a sereke dispêrin, û mînak ên ku van hokaran dispêrin herdû jî di wê de hene. Bide pey van rêberan dema tu her birgehê (paragraph) alîgir dinivîsî:

Ji pêşkêşkirin a raman ên pir di birgehê de dûrkeve. Ji ber ku birgeh bi xwe: "çend hevok in li ser yek ramanê ne".

Her birgehê wek kurte-gotarekê bibîne, wate ew e ku ramanek sereke ji wê re heye tevî hûragahî yên alîgir.

Bi kêmanî yek hûragahiyê an jî mînakekê ji her ramanek alîgir re rêzbike.

Dawî (Encam)

Birgeh a herî dawî di gotarê de ji bo tu guftûgo ya xwe berhev bikî. Dûrkeve! Ji pêşxistin a mijar û raman ên nû.

Birgeh a dawî pêwîst e:

Diyar bike ku te mijar a xwe xweş deranîye.

Raman a sereke bi peyvyan cuda vebêje.

Bihêle xwendevan bipelîne ku tiştêkî bi wate ji guftûgo ya te hînbûye.

Ve-xwendin

Armanç a ve-xwendinê ew e ku tu gotarê "şayik" bikî ew jî bi rê ya vekolan ser a rênivîsê û serrastkirin a şaşî yên rêzimanî, û heger giring be, guhertin a cih ên peyvyan an jî bijartin a peyvyan. Ji bo ve-xwendin xweş derbaz bibe, giring e tu kaxet a xwe di cî de ve-nexwîni. Demekî dirêj biêxe navber a nivîsandinê û ve-xwendinê ji bo tu bi çavekî nû li wê binêrî. Yan jî heger wext teng be bihêle mirovekî din ji bo te ve-xwendinê bike.

* *Wergerandin a bi kurtî ji beşê "Writing" ji pirtûk a "Learning Express®'s TOEFL® Exam Success In Only 6 Steps". Elizabeth Chesla 2002. New York.*

HÊVIYÊN RAZAYÎ



Ronî ELÎ

dilekurd@hotmail.com

(Heleb)

Di welatê Gumgumokan de

Ziman bi dar ve xistin

Nerîn

Di kolanên kel û pelan de

Beramberî " Styaneke "

Dinirxandin

Da ji hêviyên razayî re

Durîşmeya raperînekê

Sazkin

Û

Li darxin ...

Di mejiyekî stewr de

Bîr û boçûnan

Di gewriyên lal de

Dîroka nû jiyaneke

Li ser piştê Gakofiyekî

Bi dilopên baranê re

Ji Siyamend û Xecê re

Di çespanê

Û

Dineqşandin ...

Di welatekî pir serok

Û Simbêl boqan de

Bazaar

Alekê.. Darekê .. Malekê ..

Li ser memikên

Keçeke qeşeng û nûber

Sînga

Jineke bê bext û ber

Ji mendalên têkoşinê re

Di xwenên şevan de

Bi vîn û hêz

Germ û gur û har dikin ...

Di rûpelên dîroka rojhilatê

de

Ji zikên birçî

Lingên pêxwas

Laşên tazî

Û piştên xûz û şikestî re

Ku li ser tika sîdareyekê

Dimeşandin

Bi diwêta xwîna evîndar

Û Hêvîdaran

Serkeftinên bê hûde

Dibarandin ...

Direşandin ...

Û

Diweşandin

(22/6/2010)

HEMZE BEGÊ MIKSÎ**(??? - 1958)****(Qehremanek ji pêşengê rewşenbîrên gelê min)**

Hemze Begê Miksî

Konê Reş

koneresh@hotmail.com

(Qamişlo)



Dilname©

Hemze begê Miksî (Hemze Beg kurê Hacî Bekir) qehremanekî pêşeng bû di nav gelê kurd de. Eger navê wî lehengî hinekî di nav tariya salan de mabe jî, lê her ew wek zêrê zer e, çendî sal di ser navê wî re derbas bin, navê wî nayê zingar kirin, her û her wê navê wî bi nix û biha di nav dilsoz û wefadarên gelê kurd de bimîne.

Di destpêka çerxa 20 an de Hemze Beg yek ji pêşengên rewşenbîrên gelê kurd bû li Stenbolê. Wî jî wek hevalên xwe gelek kar û xebat di avakirina komeleyên pêşîn de li Stenbolê kir û wiha tev jiyana xwe bi wefadar û dilsozî di rêka Kurd û Kurdistanê de xerc kir.. Ciwaniya xwe di mişextî û zîvariyan de derbas kir.. Dûrî xizm, dost, heval û hogirên xwe buhirand, ji bil ku çend salên giring ji ciwaniya xwe di zindanên Kemalîstan de derbas kir..

Hemze Beg yek bû ji rojnamevanên kurd yê sereke, wî gelek kar û barên giran ji gelê xwe re pêşkêş kirine. Di destpêka sala 1918 an de yekemîn rojnameya kurd/tirkî bi navê **JÎN** li Stenbolê weşandiye, hem jî dibacak bi nix û biha di gel Mem û Zîna Ehmedê Xanî çap û belav kiriye.. Hin dibêjin ji bo çapkirina vê pirtûkê hatiye girtin û hin dibêjin ji bo rojnameya Jîn e û hin dibêjin ji bo bizav û çalakiyên wî, yê bêrawestan bi dûv pêkanîna prensîbên serokê Amerîkî Welson de hatiye girtin..

Di baweriya min de Hemze begê Miksî di sala 1928 an de ji zindanê hatiye der û yekser berê xwe daye nav kurdên Binxetê, mîna Dr. Ehmed Nafiz Beg Zaza û birayê wî Nûreddîn Zaza, mîna Arif Beg Abas, Osman Sebrî, Qedrî Beg û Ekrem Beg Cemîl paşa...û li Suriyê bûye endam di civata Xoybûnê de, ewa ku di sala 1927 an de li Beyrûtê hatibû damezirandin û ji encamên wê, şoreşa Agirî bi serokatiya Ihsan Nûrî paşa ala kurdistanê li ser çiyayên Araratê bilind kiribû..

Di sala 1930/1931ê de, piştî têkçûna şoreşê, li ser daxwaza hikumeta tirkîyê, hikumeta Fransî ya ku li Sûriyê desthilat bû dest datîne ser Hemze beg jî di gel Mîr Celadet Bedirxan, Dr. Ehmed Nafiz, Memdûh Selîm, Nûreddîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrî Can, Qedrî û Ekrem Beg Cemîl paşa, Haco axa, Mustafa û Bozan Şahîn ... û tev li Şamê xistine bin rûniştina zorê de..

Di sala 1932 an de, Hemze Beg ji rex desthilatdarên fransîyan ve dibistanekê li Eyndîwerê, di binya bajarê Cizîra Botan de vedike û zarokên kurdan fêrî ilm û zanîne dike, ew yekemîn dibistan bû ku di wê herêma de tê vekirin, hem jî di wê hingê de Dr. Ehmed Nafiz pêre kilînikekê li wir vedike.. Û di nav kurdên Cizîrê de dibe wek gerîndayekî ji kovara Hawarê re û propagande ji zimanê Kurdî re dike..

Di sala 1940 an de dibe edîtorê yekemîn dibistana fermî ya herî bilind di bajarê Heseke de li parêzgeha Cizîrê..

Di sala 1943 an de dibe berpirsiyarê dibistanan û zanîne di tevî parêzgeha Cizîrê de û di wê salê de gelek mamostayên kurd ji Şamê tene Cizîrê dibin mamostayên zarokên kurdan, (hêjî hin ji wan saxin)..

Li dor jinenîgariya wî; min gelekî da ser şopa wî lehengê kurd, min ji gelek kesan pirsî, belê mixabin, kesî tu nûçeyên wiha hêja nizanî bû. Bi tenê ji min re hat gotin ku jina wî tirk bû, zarok jêre çenedibûn, bi gelek zimanan dizanîbû. Bêtir bi van kesan re dida û distand: Mîr Celadet Bedirxan, Dr. Kamîran Bedirxan, Memdûh Selîm beg Wanli, Dr. Ehmed Nafiz, Dr. Nûreddîn Zaza, Qedrî û Ekrem beg Cemîl paşa bûn..û hin xiristyan û ermen hebûn..

Ew di roja 15 Remezana 1377 an koçî de, li bajarê Heseke, di mala xwe de çû ber dilovaniya Xwedê, anko roja (05/04/1958) û li ser dazwaxa wî, ew li gundê Dugirê, di nav goristana welatparêzên kurdan de hatiye veşartin.


Gundê Dugirê li bareşî Qamişlo ye bi dor 27 K.M an, ji welatparêzên kurdan yê ku di vê goristanê de hatine veşartin: Hacî Mûsa begê Xuwêtlî, Dr. Ehmed Nafiz beg Zaza, Arif beg Abbas, Haco axa, Silêmanê Abbas Axa, Dr. Qasim Miqdad Cemîl başa, Ebdulrehman axa Eliyê Ünîs, Hesen axa Haco...

Wek ku diyare, Hejarê Mukiryani yek ji helbestvanên komara Mehabadê bû, piştî herifandina komarê reviyabû, xwe li nav Kurdên suriyê, li bajarê Tirbespiyê girtibû û lê dijîya.. Di sala 1958 an de dema ku Hemze begê Miksî çû ber dilovaniya Xwedê, rehmetî **Hejarê Mukiryani** ev nivîsandin li ser kêla ber serê wî nivîsand:

Mamoste Hemza beg, Rehberê fidakar!.**Pir kes ji xew te kirine hişyar, Raze bi xoşî bes menale. Peyman elê me ew hewale.****Rojî ku welat bijî bibînim.****Ez mijde bi xo bo te bînim**

15 ê Remezana 1377

Koçî 05/04/1958 Zayîni



Hêjaye gotinê ye ku gora Hemze Begê Miksî di goristana gundê Dugirê de di rewşeke xerab de bû; kêlên wê hatibûn şikenandin, kevirên li dor tirba wî hatibûn belawela kirin û bi zor dihat nas kirin.. Ew jî mîna pîrrianiya gorên welatparêzên kurdan di wê goristanê de, ku hina bi mebest ew gor xera dikirin..!! Jixwe gora Hacî Musa Begê Xuwêtlî êdî kes nema cihê wê nas dike..! Ji berî çend salan ve partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîti), gora Hemze Beg restore kirin.. Em jî ji dil spasiya wan dikim.. Xwezî hina ji dewlimendên Kurdan gora Hacî Mûsa Begê Xuwêtlî jî nûjen kiribana.

DAWÎ

Dilname©

Evdoyê Heseno

evdoyeheseno@hotmail.com

(Kobanî)

Min bisoje

bi agirê evîna xwe

Termê min bike rijik

Belav bike li ser

qada herdu lêvên

xwe

Belkî rojek bê

şîn bibim

Bibim ramûsan

Û kenek bê girî

Li ser lêvên te

BIGRÎ

Bigrî ... bigrî ... û

dîsa bigrî

Ku destnimêja

xwe ji hêsrên te

bigrim

Û li ber pûtê evîna te

Rawestim û destan

hilgirim

Belkî ez û xwedê

Hêviyên xwe

Di hêsrên te de

bibînin.

BAQEK GULÊN SOR ... Dûmahîk:

-ya şerabê dilîst, ketibû. Ya çavlêketinê ew çav lêketibû, lê ma ew rojê çav bi çendan jinên wilo nediket? Te digot qey jinên dinyayê hemû bûbûn dijminên wî û li hemberî wî eniya dijminatîyê vekiribûn. Wî berê xwe bi kîjan jinê vekira, wê jinê berê xwe jê diguhert, wî li çavên kîjan jinê binerîya, wê jinê çavên xwe dadigerandin û di dagerandina awirên wê de, bêhtengî û aciziyek difûriya. Lê wê jinê, yanî jina ku wî doh li quncika bîraxaneyê dîtibû, jineke guherî bû. Gava jinekê bi hêdîka qedeha xwe biribû ber lêvên xwe yên sor, wê serê xwe jî bilind kiribû û gava serê xwe bilind kiribû, çavên wê li Cemîl ketibûn. Cemîl pêşî fedî kiribû û serê xwe bera ber xwe dabû, lê gava serê xwe bilind kiribû, dîtibû ku çavên keçikê hê jî li wî ne. Vê carê wî jî li keçikê nêribû û qedeha xwe ya bîrayê hêdîka ji wê re bilind kiribû. Keçikê jî bersiv dabûyê û qedeha xwe ya şerabê bilind kiribû û mîna ku ji nişka ve ji xeyaleke kûr şiyar bibe, bi Cemîlê li ber barê re beşî bû. Cemîl jî xwe negirtibû, hema rahiştibû qedeha xwe ya bîrayê û çûbû ser maseya keçikê. Keçik ji wê tevgera Cemîl ecêbmayî nemabû û bi beşîşin ew keremî ser maseya xwe kiribû. Cemîl rûniştibû û bi rûniştinê re destê xwe dirêjî wê kiribû û xwe pê dabû naskirin. Navê wî di bîra keçikê de nemabû, lê navê keçikê, Eva, xweş di bîra Cemîl de mabû. Ne bi tenê navê wê, spehîbûna wê jî di bîrê de mabû.

Eva bi rastî jî keçeke spehî bû. Emrê wê an bîst û pênc hebû an tunebû, bi kejiya xwe dişibîya finlandîyan. Wê porê xwe yê zer kiribû du gulîk û herdu gulîk jî bi ser sînga xwe de berdabûn. Digel ku zivistan bû û derve sar bû jî, wê bi tenê blûzekî reş î tenik li xwe kiribû. Cemîl dikarîbû bi hêsanî sudyenê wê di binê blûzê wê de bidîta. Gerdana di stuyê wê de ji mircanan bû. Di rengê mircanên di stuyê wê de jî, du guhar bi guhên wê yên biçûk ve daliqyabûn. Gava dikenîya, digel ku xemgîniyeke veşartî di mîmîkên wê de diyar dibû jî, spîbûna diranên wê yên li hev, spehîtiyeke taybetî didayê. Ev e, ev çêlkewa ku ji refê xwe veqetiyabû û rîya wê bi bîraxaneyê li ber stasyonê ketibû, bûbû nêçîra Cemîl. Cemîl pir bi edeb, bi hurmet û medenî tevgeriyabû û nexwestibû bi tu awayî nêçîra xwe veciniqîne û mîna salan dîsan destvala vegere malê.

Keçikê dîsan jê pirsî bû;

– Te got, navê te çi bû?

– Navê min Cemîl e, Cemîl gotibû.

Evayê navê wî bi awayê "Jemîl" bi lêv kiribû û jê nepirsîbû bê ew ji kîjan welatî ye. Baş bû jî ku jê nepirsîbû, heger jê bipirsîya, diviyabû Cemîl ji keçikê re behsa welatê xwe bikira û dibû ku wê yekê keçik aciz bikira û ew hewa wan ya germ bicemidanda.

Ji bo ku Cemîl ji cihekî dest bi peyvê bikira, wî gotibû ku navê Evayê navekî pir xweş e û bi rastî jî bi wî awayî sohbeta wan dest pê kiribû.

Gava Cemîl xwestibû şûşeyek şerab bixwaze, Eva li dij derneketibû, Cemîl jî şûşeyek şeraba sor ya ku Evayê berê ji wî cinsî qedehêk vexwaribû, bi maqûlî ji keçika garson xwestibû. Piştî bi kêliyê keçika garson digel du qedehên şerabê û şûşeya şerabê hatibû, pêşî ji bo tamkirinê ji Cemîl re çend qurt berdabûn binê qedehê û şûşe di dest de li bendî bersiva Cemîl rawestiyabû. Cemîl jî hêdîka qedeha xwe biribû ber devê xwe, qurtek jê vexwaribû û bi rûkenî tamxweşbûna şerabê anîbû zimên.

Şeraba wan ya xweş, piştî demekê serê wan jî hebekî xweş kiribû û sohbeta wan di bin tesîra wê xweşiyê de bihurîbû.

Bara ku êvarê vala bû, bi derengê şevê re tije bûbû, ji ber muzîka dengbilind, mêvan bi dengên bilind bi hev re dipeyvîn, Eva û Cemîl jî bi dengên bilind dipeyvîn, dikenîyan, carinan bi destên hev digirtin, carinan kûr kûr li çavên hev dinêrîn û carinan jî bi noşîn qedehên xwe li hev dixistin. Ew heta saet yekê şevê rûniştibûn û vexwaribûn. Li gora wê vexwarina zêde dîsan ew-

-zêde neketibûn, gava ji bîraxaneyê derketibûn, bi destên hev girtibûn û di bin kulyên berfê de meşiyabûn jî zêde nehejiyabûn. Ew tibabekî meşiyabûn, carinan rawestiyabûn, hevdu hambêz kiribûn û li kuçê devê xwe xistibûn devê hev û hevdu maçî kiribûn. Gava wan ji sosîsfiroşê li serê kuçê ji xwe re sosîs kiribûn saet bûbû yek û nivê sibehê. Wan piştî xwarina sosîsan dîsan hevdu hambêz kiribûn û dîsan hevdu ji dil maçî kiribûn.

Gava Cemîl pêşniyaza ku ew texsiyekê bigirin û herin mala wî ji Evayê re biribû, Eva gotibû ku mala wê nêzîktir e û heger ew dil bike ew dikarin herin mala wê. Ji xwe Cemîl li ezmanan li tiştêkî wilo digeriya, hema tavilê destê xwe ji texsiyekê re hejandibû, texsî li ba wan rawestiyabû, herdu ketibûn dawiyê û Evayê adresa xwe ji şifêrê texsiyê re gotibû. Wan di dawîya texsiyê de jî devên xwe xistibûn devên hev û bi destan hevdu pelandibûn. Herçiqaş Cemîl dixwest ew rêwîti dirêjtir dom bikira jî, texsî zû gihîştibû ber avahiya Evayê. Eva hewl dabû ku li çentê xwe bixebite û heqê şifêrê texsiyê bide, lê Cemîl ji wê zûtir tevgeriyabû û heqê şifêrê dirêjî wî kiribû. Gava ew ji texsiyê daketibûn û bi çend gavan ber bi avahiya Evayê ve meşiyabûn, Eva lê veqetiyabû û gotibû baştir e ku ew sibehê hevdu bibînin. Wê nexwestibû Cemîl bi wê re here malê, dîsan ew maçî kiribû û gotibû ew dikarin sibehê, saet di donzdehan de li ber deriyê Kulturhusetê, li meydana Sergelstorgetê hevdu bibînin.

Niha, Cemîl ji nava nivînan rabûbû, rîha xwe kur kiribû, serê xwe şuştibû, xurîniya xwe kiribû û saetên civana Evayê dihejmartin. Heger ew piştî saeteke din li trêne siwar bibûya ew ê di wextê de bigihîsta bajêr û wê bi hêsanî bigihîsta ku ji Evayê re baqek gulên sor jî bikiriya. Ew saet hat û digel ku derve sar bû jî, malneketo bi tenê vezelekî tenik û çakêtek li xwe kir û derket. Wî tam saet di donzdeh kêma çarîkekê de xwe bi baqek gulên sor gihand ber deriyê Kulturhusetê.

Destê sibehê baranek bi ser berfa doh de bariyabû, ew berf helandibû û niha jî li derve sermayeke hişk hukum dikir. Cemîl wek maqûlekî bi qevda gulên xwe girtibû, bi serê tîk û piştî rast li der û dora xwe dinêrî. Her ku wî li dora xwe dinêrî ew çend kurdên nas li ber çavên wî diketin. Ew meydan meydana meş û civînen mezin bû. Vê dawiyê, hema bêje kurd ji heftê carekê, carinan bi sedan, carinan jî bi hezaran li wê meydana dicivîyan, ji wir didan dû hev û heta konsolosxaneyê tirkan dimeşîyan. Îro jî ji bo kurdan rojeke wilo bû. Li ser daxwaz û banga komele û dezgehên kurdan wê li dor hezar kurdî li meydana Sergelstorgetê bicivîyana û wê ji wir ji bo protestokirina Tirkîyê ber bi konsolosxaneyê tirkan bimeşîyana. Cemîlê ku hema bêje di dema xwe de yek ji pêşengên tevgera welêt bû, bi banga komele û dezgehên kurdan dizanîbû, lê bi temamî ji bîra kiribû. Heta saet donzdeh û çarîkekê jî hê Eva nehatibû, lê gelek nas û dostên wî hatibûn, hinan silav lê kiribûn û derbas bûbûn, hin lê sekinîbûn û bi çend gotinan pê re sohbet kiribûn, hinan gulên di destên wî de meraq kiribûn û hinan xwestibûn di bin wê sermayê de bi dûdirêjî şiroveyên siyasî bikin, lê heta ji Cemîl dihat, kurt dibirî, guhên wî li wan lê çavên wî li rîya Evayê bûn.

Saet di yekê de kurdekî bi simbêl derketibû, bi mîkrofonê, bi dengê bilind û swêdiyeke xerab Tirkîye rexne dikir, fort dikirin û digot ku ew ê wê ji Tirkîyeyê re nehêlin. Dû re şîrek pir belengaz xwend û mîkrofon teslîmî yekî din kir.

Kurdan bi zar û zêç û jin mêran ew zirmeydana Sergelstorgetê dagirtibûn û barebara wan bû di bin wê serma hişk de slogan davêtin. - ... **Dûmahîk Rûpel: 18**

BAQEK GULÊN SOR ... Dûmahîk:

-Min ê jî saet di yek û nivê de li kafeteryaya Kulturhusetê rojnamevanek bidîta û li ser Kurdistanê û sebebên ketina eskerên tirk bo başûrê Kurdistanê hin agahdarî bidanê. Gava ez saet di yek û bîst û pênc deqan de dikira bi lez têtetima hundirê Kulturhusetê, min dît Cemîl li qorziika ber derî rawestiyaye, ji serman dirikrike, serê xwe her bilind dike û li der û dora xwe dinêre.

Min silav dayê:

– Merheba Cemîl!

– Merheba kekê, tu çawa yî?

Ew gotin hema wilo spontan ji devê wî derketin. Gava dît ku ez im, destê xwe da min û li karê min pirsî. Min jî bi çend gotinan başbûna karê xwe jê re got, û bi henek ew gulên di destê wî de meraq kir.

– Çîk, e... bavê hevaleyê ji welêt hatiye, ez niha li bendî hevaleyê me û em ê bi hev re herin mala wî hevalî.

Min ji Cemîl nepirsî bê çima ew beşdarî meşê nebûye, lê gava min xatir jê xwest û ji bo ku ez rojnamevanê xwe bibînim bi pêlikan bi jor ketim, min di dilê xwe de got, ku kurd çiqasî hatine guhertin, çiqasî medenî bûne, binêre, wê camêr ji bavê hevalê xwe re gulan bibe.

Hevdîtina min bi yê rojnamevan re nîvsaetê ajot, dû re em herdu bi hev re daketin jêr. Gava em daketin jêr, min dît Cemîl hê jî li ber derî rawestiyaye. Bêyî ku em xwe mîna japoniyên zêde bitewînin, me bi bişirîneke xav silaveke japonî da hev û ez bi yê rojnamevan re di ber Cemîl re bihurîm.

Ew meydana Sergelstorgetê ya ku berî bi nîvsaetekê ji ber dengên sloganên kurdan himehim jê dihat, niha vala bûbû, ji du kesên serxweş ku qutikên wan yên bîrayê di destên wan de bû û dihejiyan pê ve kes lê nemabû. Êdî dengên sloganên kurdan ji dût ve jî nema dihatin bihîstin. Gava em derbasî aliyê meydana yê din bûn, ez dîsan di ser stuyê xwe re zivîrîm û min li Cemîl nêrî.

Cemîl li ber deriyê Kulturhusetê diçû û dihat, ew baqê gulan geh dixist vî destî geh dixist destê din, serê xwe wek serê marekî avî bi vê de û wê de dizivîrand, ji serman dirikrikî û dipa... (1995)

* *Firat Cewerî di sala (1959) an de li Dêrika Mêrdînê hatiye dinyayê. Di destpêka salên heftêyan de bi malbata xwe re koçî Nisêbînê kir û di dawiya heftêyan bi hin hevalên xwe re komeleyeke kulturî ava kir. Nivîskariya Cewerî ya bi kurdî jî di wan salan de dest pê kir.*

Firat Cewerî bi armanca nivîsandîneke azad di sala 1980 de terka welêt kir û li Swêdê bi cih bû. Di eynî salê de jî wî kitêbeke xwe da çapê. Ji wê salê û bi vir de Cewerî di nav tevger û çalakiyên edebiyata kurdî de ye. Di destpêka salên heştêyan de wî bi nivîs û çîrokên xwe beşdarî li kovarên kurdî yên seranserî dinyayê kir. Wî di adara 1992an de dest bi weşandîna kovara Nûdemê kir û deh salan bêyî navbir derxist. Cara pêşî bi Nûdemê edebiyat û siyaseta ji hev hat veqetandin. Herweha wî bi riya Nûdemê bi çendan navên nû li edebiyata kurdî zêde kirin û di aktuelhiştina edebiyata kurdî de roleke mezin list.

Di prosesa weşana Nûdemê de Cewerî kovareke xwerû werger bi navê NÛDEM WERGER derxist û weşanxaneya Nûdemê ava kir. Bi riya weşanên Nûdemê wî nêzikî sed berhemên kurdî pêşkêşî kitêbxaneya kurdî kirine. Herweha wî kovara HAWARê ku bîngehê edebiyata kurdî ya nûjen e, ji nû ve civand û mîna du cildan çap kir.

Firat Cewerî ji destpêka 1980 de çîrokan dinivîsîne û ji nivîsê sirgûnê çîroknivîsê pêşî ye. Çîrok û kitêbên wî wergeriyane swêdî, almanî, erebî, tirkî, farişî û zaravayê soranî û çîrokên wî di antolojiyên swêdî, almanî, erebî û tirkî de jî cih girtine û bûne film û piyes.

Cewerî bi herdu romanên xwe Payîza dereng (2005) û Ez ê yekî bikujim (2008) wek romannivîs bal kişand ser xwe û niha di romannivîsiya kurdî de navekî girîng e.

Firat Ceweriyê ku di warên cihê de sêzdeh kitêb nivîsandine û panzdeh kitêb jî wergerandine kurdî, hê jî li Swêdê dijî, endamê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê ye û di Komîteya Karger ya PENa Swêdê de serokê Komîteya Nivîskarên Sirgûnê ye.

ÇANDA PIROJEYA XWEKUJIYEKÊ



Fadil Temo

fadiltemo@hotmail.com

(Kobanî)

" *Lê ez namirim*

Berî ku ez

Gerdûn bi hêsrên xwe

Bin-av bikim "

M . EIMaxût

Jiyan

Dibînim çêtir e

Ku ji bédengiyê bimirim

Ji

Ku ji geweziyê bijîm

Evîn

Rûberê ku evîna te

Di dilê min de

Vala hiştî

Tiştêk tijî nake

Ji pêvî .. guleyekê

Yar

(Erê qîza Mustexanim)

Di xewnên xwe de jî

Li te tenê ez digerim

Di demê ku

Li aliyê dî

Zirtek

(jê re dibêjin mêrê te)

Cilên te

Ji te dike

Cilên bin

Bila bimrim

Ditirsim tu bimrî ..

berî bimrim

Wê hingê

Sed mirinî bi hev re

Ezê bimrim .. berî

bimrim

Ji (X...) re

Hestiyê ku

Ji devê kûçikekî

Bi zor hatiye

derxistin

Çiqas bi don be jî

Çavên min ti caran

Tijî nake

Hestek

"Bi kirê"

Di gewdeyê xwe de

dijîm e

Ne cihek

Xelk li cihekî digere

Ku guncaw be, ku lê bijî

Ez li cihekî digerim

Ku guncaw be

Ku ez lê .. bimrim

Ne riyek

Ji (wê) re

Min nizanibû

Ku çawa

Ez ji bo te bijîm

Riyekê di ber min ke

Ku tê de

Ji bo te .. ez bimrim

Ferehî .. Ferehî ..

Ferehî

Ta bi qerqerê min

be, li min fereh e

! .. ?

Li nêzikî te

Ez nikanim

Te bibînim

Nizanim çira li dûtî re

Ez li te digerim!!

Di jiyane de

Ez nikanim

Te bibînim

Çawa di mirinê de

Ezê te bibînim?!

HEVPEYVÎNEK LI GEL: MEELE E'BDELLA YÊ MELLE REŞÎD Ê XERZÎ©




Hevpeyvîn:

Muhsin Seyda

mihsinseyda@hotmail.com

(Kobanî)



Muhsin Seyda: Seyda ji kerema xwe hun dikarin hinekî li ser jîyan, xwendin, û devera hun jê hatine behis bikin?

M. E'bdellah: Bi navê xuda, bavê min di wextê Şêx Se'îd de hevalê wî bû, û şîrîkatî di şoreşê de kiriye, di wê sala ku şoreşê destpêkiriye, ez di wê salê de pênc mehîn bûme, şoreş zehf nema nêzîk du meh sê mehan ma, lê bavê min di çiyayên Sasûnê de ma, ji sala (1925) an heta (1928) an bavê min di çiyê de ma. Pişt re em hatine Binya Xetê, em hatine Amûdê, li Amûdê du buyer bi min re çê bûn, yek jê ez di dawa Seydayê Mele Salih de sinnet kirim, ya din otombîlê pêl min kir lê xwedê ez parast im. Pişt re min li cem bavê xwe xwend, ji me re qîseta mîletê kurd digot û behsa ewê dijminê mîletê kurd in dikir ku bi rastî ji misilmantiyê derketine, yanî ev sîtema ku li kurdan dikin, bi navê wekî ku "helale" dikin, bi navê "qanûna ejnebî" dikin, ne ku dibêjin zilim li Kurdan heram e emê bikin heta ku bibne wek Hecac ê zalim, hecac digot ; Ez zalim im, evên han ji xwe re teiwîlekê jî dikin, ji ber ku qanûn ejnebîye, dibêjin ku; wextê em bibne hakimê welat her tişt ji me re duriste, li cem wan qanûn tê çêkirin, qanûn ne a xudaye, emê bêjin helal e, emê bêjin heram e, kuştin çiqas li mîlet çê bibe ji bo daxwazên wan xem nîne, çimkî dibêjin ku hedef û armanc durist be, wesîle û destek jî duriste. Li gora mirovatîyê, wekî ew dibêjin, û yan li gora diyanetan tev de, ew di herdû cihan de di gunehkariyê de ne, daxwaza wan jî ku vî mîletî, bindest û zelîl bikin, ev gunehkariye, û karên ku dikin, kuştin, hejarî, perîşanî û derxistina wî ji welatê wî, ev tev de gunehkariye, di temamê diyanetan de û di temamê qanûnên mirovatîyê de. Lê Kemal û xeyrî Kemal ev tişt dikirin. Bavê min hêj di sala (1903) an de şerê Tirkan dikir, wextê ku (1914) an de şerê Rûsan û Tirkan çêbû bavê min digot neçine şerê Rûsan. Min li cem bavê xwe xwend heta sala (1942) an û bavê min çû ber dilovaniya xwedê, min xwendina xwe bêtir li cem bavê xwe kir, lê belê hinek seydayên minî din jî hene, wekî; Şêx Mehmûd ê Qerekoî, seydayê min Şêx Ehmed ê Xizna û kurê wî Şêx Elaedîn, Mele Mihêdîn ê Xerzî, Mele E'liyê Zûqeydî, Seydayê Şêx Mehmûd ê Zûqeydî, birayê min seydayê Mele Mihemed. Lê xwendina min e bingehîn, û hiş û zanîna min bêtir ji bavê min e. Pişt re, ev zilim û zora ku li Kurdan dibû di bîra me de bû, em hişyar bûn û tiştê ji me hat di xizmeta vî mîletî de me kir, bi dest ji me nedihat, bi ziman me kir, çimkî wekî gotina Pêxember: Kesekî ji we xerabiyek dît bi destên xwe rakin, ew ji hakimî re dibêje, û yê ku bi dest jê neyê bera bi ziman be, ew jî ji a'liman re dibêje, hinekan wisa mane kiriye û manakî xweşikê jî. Di xizmeta gelê kurd de tiştê min-

-nivîsîn e çendîn hene tev de bi zimanê Kurdî ne, çî ku min didît bi zimanê E'rebî pêwistî bal çêkirina kitêban ve bi alî me ve nîne. Carekê Seydayê Mele Ebdiletîf, Xwedê jê razî be, berî here ber dilovaniya Xwedê bi mehekê, min dît ku du pertûkan dinivîsîne, ji min re got: Ka li van pertûkan meyzêne tu çawa dibînî? Yek jê di behsa Pêxember de bû, û yek jî "licaza Qur'an" ê ya Baqilanî bû, kurt dikir. Min jê re got: Herdû pertûk baş in û nebaş in! ji min re got: Wilo çawaye? Min got pertûk bi xwe baş e, lê çî ku bi zimanê E'rebiye nebaş e, îca bi şit destê xwe li milê min da û got: Kanî Xanî? Kanî feylesûf ê Kurdan? We çî kir ji pertûkên wî? Min got: Seyda em bindest in, kengî em serê xwe bilind bikin em ê qedrê Xanî bigir in, aniha jî li Kurdistan ê min didît li her cihên pêşmergan wênayê Xanî û pertûka wî di dest de, qedrê wî heye. Min bi vî awayî xizmeta gelê xwe kir, û her kesê kar dike ji bo kurdan kêfa min ji wan re tê.

Muhsin Seyda: Seyda ji kerema te, me xwest tu ji me re behsa pertûkên Kurdî, hucre Kurdî, li kîjan deverê li Kurdistanê bêtir Medreseyên Kurdî hebûn? Pertûkên di wan de dihatin xwendin bi zimanê Kurdî bûn yan bi zimanê Erebebî bûn?

M. E'bdellah: Derfetên me nebûn em pertûkan çap bikin, me di pertûkên çapkirî de dixwendin, yên çapkirî tev de bi zimanê Erebî bûn û yên ne çapkirî bi zimanê Kurdî bûn, wekî Tesrîfa li ser Iziyê ya Mele Eliyê Termûkî (Teremaxî) feqan ew jiber dikir. Pişt re pertûkên me yên Kurdî hebûn yên ku me dixwendin û me ew jiber dikirin wekî; Nûbihar û Eqîda Şêx Ehmed ê Xanî, Nehcil Enama û Tecwîda Mele Xelîl ê Sêrtî, Zirûf û Terkîb ew jî li ser E'wamil ya Circanî hatibû çê kirin, Tecwîda seydayê Mile Mihemed ê Licî, Siril Mehşer ya Feqe Reşîd ê Alikî, berya dused salî nivîsiye, pertûkek pir xweşikê di behsa Heşr ê de ye, Rewdîl Ne'îm ya Şêx Ebdil Rehman ê Aqtepî hebû, rehma xwedê lê be. Pertûkên Kurdan hebûn lê ji ber perîşanî û hejariya wan nikarîbûn çap bikin, aniha jî em nikarin pertûkên xwe çap bikin. Li gor dîtina min hişyariya Kurdan piştî Çaldêran û Mem û Zîn a Xanî çê bûye. Carekê, xwedê jê razî be Î'sa Siwar ji min pirs kir, got: Ev Mem û Zîn çî ne? Min got her wekî Şêx Se'îd ê Palo mane kiriye, her wekî feylesofekî Eropî mane kiriye, her wekî Xanî îşaret kiriye ku dibêje: Ev çîrok min kiriye bihane ji derdên xwe re, min got : Nexêr Memo ne kurek e û Zînê jî ne keçikek e, Memo navê mîletê kurd e.....

Muhsin Seyda: Seyda te behis kir ku Şêx Se'îd Mem û Zîn mane kiriye, di kur de mane kiriye?

M. E'bdellah: Şêx Se'îd di civatên xwe de ev yek digot, der heqê vê yekê de tu pertûk çê nekirine, ji xelkê re xuya û diyar dikir ku vaye berî min jî Şêx Ehmedê Xanî ev tişt gotiye û xizmet jê re kiriye. Tirkan jî çî cih bidîtana ku Mem û Zîn tê de heye diçûn dişewitandin û digotin: Ev şoreşên kurdan tev de ji ber Mem û Zînê ne. Bi rastî Mem û Zîn berhemeke pir hêjaye, min jî nêzîk (35) rûpelan li ser nivîsiye. Xanî dixwaze bêje ku Mem û Zîn çiroka jiyana gelê Kurd e, Memo navê mîletê kurde û evîndarê jiyana xwe ye. Pişt re Şêx Ehmedê Xanî dibêje: Ev mîletê Kurd kî lê hukim dike, dibêje bi navê diyanetê lê tê hukim kirin û bi navê diyanetê hatiye xapandin, carna bi navê Zerdestîyan, bi navê Î'sewîyan, bi navê Misilmanan, carna jî bi navê Şêxan, Beko jî di Mem û Zîn ê de sembola ew kesên ku ji xwîna kurdan in û xizmeta wan ji dijminên kurdan re ne.

Muhsin Seyda: Seyda di nava kurdan de, gelo zanayên kîjan deverê bêtir bi nav û deng bûn, Botan, Behdînan....?

M. E'bdellah: Bê guman kurdên Iraq ê zana ne û gelek navdar ji wan derketine wek "Ibin Selah Elşehrezûrî" û di demên nêzîk de Mewlana Xalid ku di "Ilim ê Zahir de", di softîyê de, û di xizmeta mîlet de, pêşkêştire ji hemûyan. Mewlana Xalid hate herêma Barzan cem Şêx Ebdil Selam, bapîrê Barzanî, ew kire xelîfê xwe û tev çûn e Nehr ê cem Seyid Taha yê Şemzînî û ji wan re got: Divê hun xizmeta mîletê xwe-... **Dûmahîk Rûpel: 20**

HEVPEYVÎNEK LI GEL MEELE E'BDELLA ... Dûmahîk:

-bikin, Şêx E'li yê Palo, bapîrê Şêx Se'îd, ew jî xelîfê Mewlana Xalid bû, pişt re Tirkan Mewlana sirgûnî Şam ê kirin û li wir çû rehmêtê. Evên ku di terîqeta Mewlana Xalid de ne û dane pey wî hemîyan xizmeta miletê xwe kiriye, wekî: Mala Barzanî di terîqa wî de ne û heta aniha riya wî dibêjin. Min dît ku Barzanî gelekî qedrê Neqşebendiyan digirt û behsa wan dikir nexasme yê Mewlana Xalid. Barzanî carekê ji me re got : Şêxê welîyê Xwedê kiye? Ew e yê ku dilê wî tijî nûr e, wekî Mewlana Xalid û Şêx Ehmed ê Barzanî. Evan tev de xizmeta milet kiriye, çimkî didîtin ku dîn di bin destên xelkê de çê nabe, Qur'ana Kerîm (6235) ayetîni temam di herba zilmê de ye bi her rengê wê.

Muhsin Seyda: Baş e Seyda, gelo Şêx Ebdil Rehman ê Taxî ew jî gîha Mewlana Xalid, hevdû dîtin?

M. E'bdellah: Nexêr, Şêx Ebdil Rehman negîha Mewlana Xalid, lê di wextê Seyid Ibêdilal kurê Seyid Taha de ku şoreş di sala (1883) de li darxist, Şêx Ebdil Rehman bavê Hezret ragihand ku divê em tev de bibin fidawî yê wî, ev yek di Mektûbatê wî de heye.

Muhsin Seyda: Kerem ke Seyda, em dikarin bêjin ku şoreşa Şêx Ibêdilal wekî şoreşa Mehdî li Sûdan ê, yan wekî şoreşa Sinosiya li Lîbya ye?

M. E'bdellah: Sofiyani xizmet kiriye, û Mehdî û Qutb û Xewsên me jî hene, lê derdên me jî gelekî, Şêxê Taxî kir, Hezret xwest bike lê pê re derneket, Mala Xews wan jî xizmet kirine.

Muhsin Seyda: Baş e Seyda, xelîfeyên Hezret li Sûrî jî çêbûn lê ji bo kurdariyê tişt nekirin, ji bo çi gelo?

M. E'bdellah: Nexêr, tu li vir hinekî pê nizanî, yek ji xelîfên wî şêxê me bû, Şêx Ehmedê Xizna, xizmetek gelekî mezin ji kurdan re bi mal, bi ziman, bi siyaseta kir, heta navê wî di partiya Xuybûnê de hebû bi navê Ehmed Murad. Şêx Ehmed digot: xizmeta vî miletî li ser me tevan wacibe û ê min mal ji min tê û siyaseta jî li we, Şêx gelekî jîr bû, jê xwestin ku here şerê Ingilîzan li Iraqê neçû, şerê Filistinê neçû, Şêx Biraîm Heqî razî bû ku here.

Muhsin Seyda: Seyda ji kerema te ka em vegezin behsa xwendinê li nav kurdên Sûrî, em dibînin Amûdê xwendin li wir bêtir çêbûye, gelo sebeb çi ye?

M. E'bdellah: L'lim û zanîni li Amûdê zêde bû bi xêra Seydayê Mele Ibêdilal û birayê wî Seydayê Mele Fethulah xwedê ji wan razî be.

Muhsin Seyda: Xelkên kur bûn Seyda?

M. E'bdellah: Ji Hîzan bûn, ewan l'lim û zanîni belav kir li vê herêmê nexasme li Amûdê, gelek feqê li wan kom bûn û fêde ji wan dîn. Tevgera Feqan di nava kurdan de gelekî xurt bû, di her gundekî de melak hebû û çend feqên wî hebûn, ne tenê li nav Kurdên Sûrî, li her deverên Kurdistanê. Bavê min dibêje carekê zivistanbû, du meriv ji Wanê hatine cem me Diyarbêkrê û gotin: Cî bi dest me neketiye em ji xwe re bixwînin, îca Şêx Ebdil Rehmanê Aqtepî ji bavê min re got: Tu çi dibêjî. Bavê min got em ji nanê xwe kêr bikin emê wan jî bi cî bikin.


Muhsin Seyda: Seyda feqên Seydayê Mele Ibêdilal li Amûdê kî bûn, yêni ku li cem xwendin û l'lim wergirtin?

M. E'bdellah: Feqeyên wî teva xizmet kirin û xizmeta tevan jî bilin de, lê yê herî xuya Seydayê Mele Ebdiletîf bû, Mele Ebdil Helîm bû.

Muhsin Seyda: Seyda pêş ku Seydayê Mele Ibêdilal dakeve Binya Xetê, xwendina feqetiyê hebû? Hin kes dibêjin ku xwendina feqetiyê Kurdên Mihacir anîne nav kurdên binxetê, ev rast e gelo?

M. E'bdellah: Ev gotin raste, melayên ji êlên kevin yêni vê derê wekî: Deqorî, Aşîtan, Alî yan, Kîkan, Milan, hebûn lê pir hindik bûn.


Muhsin Seyda: Navên wan tîni bîra te Seyda?



Dilname©
Şêx Ehmedê Xizna



Dilname©
Seydayê Şêx Salih



Dilname©
Seydayê Melle E'bdil Letif

M. E'bdellah: Di nav Kîkan de Mele Xelîl hebûye, lê xwendina wî ne xurt bûye. Di nav Aşîtan de Mele Ibrahim hebû, hate cem Seydayê Mele Ibêdilal xwend, lê car dî xwendina wî ne xurt bû. Derbarê mihaciriya kurdan de, du hicret hene; yek ji ber Rûs an bû û yek jî ji ber Tirk an bû.

Muhsin Seyda: Seyda ji bo şerha dîwana Cizîrî ya Seydayê Zivingî, rehma xwedê lê be, hin nivîskar dibêjin ku ya Mele E'bdil Selam e û Zivingî nisbetî bal xwe ve kiriye, tu çi li ser vê mijarê dizanî?

M. E'bdellah: Min dît seydayê Mele Ehmed ê Zivingî (Miftî) diçû li cem Mele E'bdil Selam (Nacî) dixwend şerha wî heye ya dîwana Cezîrî lê hêj nehatiye çapkirin*, şerha Mele E'bdil Selam kurt e, seydayê Zivingî sûd jê wergirtiye û lê zêde kiriye, wek mînak; Zivingî di şerha xwe de dibêje: (Hasil El-meina) ew ya Zivingî ye û ji gotinên wî jî fêde kiriye û carna jî lê zêde kiriye .

Muhsin Seyda: Seyda gelo seydayê Zivingî jî bi Farsî dizanîbû?

M. E'bdellah: Erê wî jî dizanîbû, melayên kurdan bêtirên wan bi Farsî dizanîbûn û bi xêra bavê xwe ez jî fêrî zimanê Farsî bûm, û min Gulistan a Se'îdî wergeran de Kurdî.

Muhsin Seyda: Seyda piştî rojnameya Kurdistan, Hawar û Ronahî derketin, gelo ev kovar digihîştin destên melan û di nav wan de hebûn?

M. E'bdellah: Ez gihîştim wan û gihane destên min, hejmarên Hawar ê tev de li cem min hebûn, pişt re ez çûm e Iraqê (Kurdistan a Iraqê) li wir çend hejmar bi emanetî yekî ji min stend û yêni dîtin di wexta şoreşê de min ew û teqîlo ya xwe xistine şikeftê û tê de man.

Muhsin Seyda: Seyda gava ku Hawarê tîpên xwe ji e'rebî kirine latînî, vê yekê di nav melan de çawa rû da? Gelo ev behs dibû?

M. E'bdellah: Bi xwedê ev behs di nav melan de hinekî lawaz bû. Wexta ku Cegerxwîn dîwana xwe çap kir di sala (1942) an de, hate cem Şêxê me Şêx Ehmed, Şêx jê re got: Cegerxwîn te çûye bi latînî nivîsiye, li vê derê ji xeyrî Şêxmûsê Qeraş kes bi latînî nizane.

Muhsin Seyda: Seyda Şêxmûsê Qeraş kiye?

M. E'bdellah: Yekî ji Êstîlê bû, îca Şêx got: Eger te bi tîpên e'rebî nivîsî ba wê melan tev de zanîba, Şêx keder kir ku çima ne bi tîpên e'rebî ye û (500 L.S) dane Cegerxwîn û jê re got zêde jî heba min ê bi te da. Kurd ne dijminê latînî ne, lê propakendîni dijminan di heqên kurdan de gelek bûn. Hiznî Mukriyanî " Minhac " a Îmamê Newewî kire Kurdî, melayên Rewandîz û Erbîlê gotin: Ku Hiznî gawir bûye, çimkî pertûkek çê kiriye ne bi zimanê e'rebiye bi zimanê Ehlê Cihenemê ye, Gêw Mukriyanî ji min re got ku: Seyid Tahir qaymeqam ê Rewandîzê şande pey me û ji wan melan re got: Çi heye di nav bera we û Hiznî de? Gotin ku Hiznî pertûkek bi zimanê ehlê cehnemê çê kiriye, îca Hiznî got hun bi vî zimanî diaxivin, min axaftina devê we nivîsiye, min tiştê zêde nekiriye.

Muhsin Seyda: Seyda gelo rojname " Kurdistan " digîha van deran? ... Dûmahîk Rûpel: 21


HEVPEYVÎNEK LI GEL MEELE E'BDELLA ... Dûmahîk:



Şêx Se'îd Bêran



Hiznî Mukriyanî



Cegerxwîn

M. E'bdellah: Ez nizanîm, lê mellak hebû nema navê wî tê bîra min jê re digotin Bavê Ristem, ew î xwendibû û hişyar bû, dibe ku hatibe cem wî, lê yên dîtî na.

Muhsin Seyda: Seyda tiştê ku balkêş e, ew e ku melayên kurdên Sûrî kêr nivîsîne, çi bi kurdî, çi bi Erebî, ev yek ji ber çiye?.

M. E'bdellah: Berî anîha jî min got, derfetên em pertûkên xwe çap bikin nebûn. Bavê min behis dikir ku " Enwar " a Erdebîlî ku du çerm in, kirine kurdî lê wînda bûn.

Muhsin Seyda: Seyda ka em behsa nivîsên te bikin, gelo te çend berhem nivîsîne?.

M. E'bdellah: Min Gulistan a Se'îdî ji Farsî wergerandiye Kurdî, çi ko min dît ku Barzanî gelek caran di civetên xwe de behsa çîrok û hikmetên wê dikir. Kefîle û Dimne min ew jî wergerandiye, " Kitab El-exder" ya Qezafî min wergerandiye kurdî, guft û goyek di navbera min û şêxekî Serxetê de heye, ewî xwestiye ku kurd nexebitin û tevgerê nekin min jî bersiva wî da ye, guft û goyêke dirêj e min ew jî hûnaye û li cem min heye. Min li ser Cegerxwîn nêzikî (40) rûpelî nivîsiye, min qedrê wî girtiye û min ew rexne jî kiriye, heman rexneyên ku min di saxiya wî de jê re digotin. Lê min bi edeb ew rexne kiriye.

Min pertûkek nivîsiye " Lihevhatina S û Ş " ev pertûk li ser lihevhatina di navbera Sinê û Şî'î yan de ye, min Mewlida Kurmancî nivîsiye .

Muhsin Seyda: Seyda berê jî Mewlida kurmancî heye, çi cidatî di navbera mewlida te û yên berê de heye?.

M. E'bdellah: Ew kêmaniyan di Mewlidên berê de min xwe ji wan bi dûr xistiye.

Muhsin Seyda: Seyda wek Mewlida Melayê Bateyî?.

M. E'bdellah: Belê, Bateyî ji lbin Hecer wergirtiye, hin nerîn tê de hene bi rastî ne yên ku mirov di civatan de bêje.

Muhsin Seyda: Seyda tu çi li ser jiyana Mele Mehmûd ê Bayzîdî dizanî? Em dibînin ku gelek navdarên Kurdan paşnavên wan Bayzîdî ye, tu vê yekê vedigerîni çi?.

M. E'bdellah: Bayezîd ciyê Ehmedê Xanî ye, eger ew der bibe çiyayê xwendin û zanîne, tu bawer bike, evê ku Tuhfet El-amîlîn çêkiriye, car dî ji xelkê Bayzîdê ye. Pertûkên Mele Mehmûd ê Bayzîdî wergera " Şeref Name" heye hêj nehatiye çap kirin, xwezî bihata çap kirin.

Muhsin Seyda: Seyda eger tu bala xwe bidî pirtûkxaneyên melayên Kurdan, tu dibîni pertûkên wan tev de pertûkên fiqhê ne, pertûkên dîrokê tu di nav pertûkên wan de nabinî, çima gelo?.

M. E'bdellah: Ez dikarim bêjim ji ber perîşaniya wan e, û di diyanetê de pêwistî gelek bi pertûkên dîrokê nîne, ji ber ku ne tişkî bingehîn e di xwendina wan de .

Muhsin Seyda: Seyda, gelo xelîfeyên Şêx Ehmed ê Xizna, rola wan hebûye ji hêla netewî û zanîne de, di nav Kurdên Sûrî de?.

M. E'bdellah: Zanîna wan hebûye, yên ku min ew dîtî hemî bi exlaqên mezin bûne û dîn bi rastî ji xelkê re digotin, tev de jî zahid bûn, ji terzên kevin bûn. Yek jê Seydayê Mele Ebdil Letîf bû, deryakî ji xwendinê bû, birayê min seydayê Mele Mihemed deryakî ji zanîne bû, Hacî Mûsa bi rastî ji alî şerîetê de kafîyê me bû, Seydayê Mele Ebdil Rezaq belkî zêdeyî sed mucazên wî hebûne, Seydayê Mele Salih, min dît di zanîna xwe de û di teqwaya xwe de di dereca hêja bû ku mirov ji xwe re bike mînak. Xelîfeyên Şêx gelek in û tev de xizmet kirin, lê hevalê Şêx bûne û wî çi îşaretî wan dikir bi wî karî radibûn, ez ji te re mîsalkê bêjim: Şêx xwest ku alîkariya Qadî Mihemed bike, bi hiceta ku pira Seydayê Taxî xera bûye, pere kom kirin û şandin

Muhsin Seyda: Seyda tu delîl li ser vê hene?.

M. E'bdellah: Baş e ku tune, eger delîl hebin xelk bela xwe ji me venakin. Şêx ê me mezin bû, xelîfê Hezret bû û peyrewê Mewlana Xalid bû, xîreta wî pir hebû. Ez li civatê hazir bûm, Şêx Ehmed got: Hêviya me li Mehabad ê bi Qadî û Barzanî gelek hebû, lê wê kurd rojekê bigihên heqê xwe.

* *Dîwana Cezerî - şerha Melle E'bdîselam li weşanxaneya Spîrêz (2004) li Duhokê hatiye çapkirin.*

- *Ev hevpeyvîn li ser CD tomarkirî heye (DILNAME).*

ZOYA ALBOMÊ XWE YÊ DUYEM LI STENBOL Ê AMEDE DIKE



Hunermend û stranbêja kurd ya dengxweş Zoya, di sala (1986) an de li bajarê Qamişlo - Sûriyê ji dayik bûye, û bi hunermend û kemanîst Lezgîn Xalid re zewiciye, û lawekî wan bi navê Ayaz heye, û jiyana xwe li bajarê Serê Kanî yê didomîne.

Zoya di sala (2003) an de dest bi stranê kiriye, û yekemîn car bi rengekî fermî li pêş cemawer di şahiya zewaca xwe û Lezgîn de stra ye, ango bi temenê (17) salî dest bi hunera mûzîkê kiriye.

Zoya bi albomê xwe yê yekemîn bi navnîşana Çavê Te û hin stranên bedew derket holê, wek stranên: Min ji te hezkir, Ehmedê Xanî, Evîn, Esmerê, Nema zanim ... h.d. Bi van stranan Zoya zû bala cemawer kişand ser huner û dengbêjiya xwe ya sekeftî û nav û deng stend.

Di sala (2004) an de, Zoya di vestîvala çand û hunerê de li bajarê Amedê ê bi hunermend Mistefa Xalid û Husên Şakir re beşdarbûye, û di Newroz sala (2007) an de li bajarê Dubey - Îmarat bi hunermend Necmedîn Xulamî û E'îlî Aşitî re beşdarbûye, û li bajarê Duhokê ê jî di ahengekê de bi hunermend E'bdilqehar Zaxoyî re amede û beşdarbûye.

Ji nû yê Zoya, albomê xwe yê duyem amede dike, û dê li bajarê Stenbolê - Turkiyê tomar û belav bike.

KOBANÎ ... Dûmahîk:

Bi dîtina min, heye ku çêkirina xeta trêne ya di navbera Berlînê û Bexdadê de (1903-1910) rolek di avakirina Kobaniyê de leyztibe. Va xeta, ya ku projeyê Dewleta Osmanî bû, bi piştgiya aborî ya bankên almanî û serpereştîya muhendîsên almanî hat çêkirin. Beşekî wê di şûna ku navê wê yê osmanî Murşit Pînar (Kaniya Murşid ya ku îroj bûye beşekî ji Kobaniyê) bû re derbas dibû. Ji bo xeta trêne (ya ku îroj bûye sînorê di navbera beşê tirkî û yê sûrî de) kevirên reş ji binê Kaşê Miştênûrê, başûrê Mikteleyê, hatibûn derhanîn. Bêyî guman bi sedan karker, serpereşt, pispor û mamûr ê ji bo projeya xeta hesinî di kar de bûna. Bi dîtina min, şûna herî munasib ya navendeke ji bo kesên bi projeyê ve mijûl ê şûna ku dûre wek Kobanî hatî binavkirin bûya.

Destpêka salên 1920an, li dû şerê cihanî yê 1emîn û têkçûna Dewleta Osmanî, êdî Sûriye di bin serpereştîya fransî de bû. Bi texmîna min, û li gorî ku min ji hinek pêşiyên me bihîstîye, fransiyan navendek li şûna Kobaniya îroj ava kiribûn, navendeke ku roj bi roj ber bi bajarbûnê ve çûbû. Wek min got, heye ku şopine wê şûnê bi dora 10 salan berê, dema çêkirina xeta trêne, dest pê kiribin. **Guman tê de niye ku navê "Kobanî" ji yekê ji van peyvan hatiye, peyvên ku hemî wateya "şirket," yan "komeke ji leşgeran" didin: Company, Kompanie, Compagnie.** Kurmancan ji navekî wek "automobile" (wek "otomobîl" dihêt xwendin) van navan çêkirine: Tombîl, trimbêl, tomofîl û otomobîl. Bikarhanîna "Kobanî" li şûna peyveke wek "company" ya ku wek "kompanî" dihêt ser zimên ne tiştêkî mathîştîne ye. Loma, bikarhanîna navekî wek "Koban," sedem çî bin jî, ne durîst e û xarkirina rastiya dîrokî ye.

Kobanî ya destpêkê bûkeke bajarokan bû, hem ji aliyê erdnigarî û danîştvanên xwe ve û hem jî ji aliyê xizmet û tiştên xwe ve. Li gorî ku min ji bavê xwe û hinekên din bihîstîye, ji salên destpêkê ve li Kobaniyê çayxane, meyxane, firoşgehên corbîcor, xizmetên hukûmetî û heta tiyatroya jî, hebûne. Xwendegeheke keçan jî hebû. Xwîşkên min Şaybeyê, Zaydeyê û Xezalê jî tê de fêrî xwendin û nivîsandinê bû bûn. Karbidestîya fransî li navenda bajêr taxeke ku binê wê bi kevirên reş yê çarqunc hatibû nixamtin çêkiribûn, wek yê mirov li bajarokine fransî dibîne. Wan kevîran bi salan ew taxa pak û bedew hîşt ta ku hatin rakirin... Navenda bajarê berê li aliyê bakur yê Kobaniya îroj bû. Ji bakurê mizgefta kevn dest pê dikir û ber bi rojava diçû, ta digihîşt şûna ku wek "Qehweya Karmên" dihat nasîn. Li wir ber bi bakur diçû û digihîşt xeta trêne, xeta hesinî, sînor.

Ez negihîştîm tiyatroya bajêr. Digotin keçên bedew yê hunermend, dans û vexwarin tê de hebûn. Lê Kobaniya dema zarokîya min, Kobaniya destpêka salên 50an baş dihêt bîra min. Gola li rojavayê bajêr tîji av bû, rûbara jê dihatî der xwe di nav baxçeyan re digîhand navenda bajêr, di binê pireke biçûk re xwe digîhand pêş mizgeftê û di nav baxçeyan re ber bi Kaniya Ereban û Deşta Sirûcê ve diçû. Şûna tîbîniyê ye ku yek ereb jî li vê şûna bi navê Kaniya Ereban nebû. Heye ku nav ji vir hatibe: Koçerên ereb havînan pezê xwe ji çola aliyê Reqqeyê ji bo çêrandinê ber bi bakur ve dibirin û li vê şûnê av didan. Heye ku nav ji vir hatibe, yan ji navê osmanî: Arap Pînar.

Kobaniya salên zarokîya min bajarokekî pak û xweşik bû. Ew di navbera gola li rojava, ava bîrên Romanan (Ava Qînê) li başûrê rojhilat û ava li pêş girê Kaniya Ereban dihatî der li rojhilat wek bûkeke bi kincên şîn bû. Danîştvanên wê yê destpêkê dikaribûn wek "bajarî" bihatana binavkirin. Dora nivê danîştvanan ermenî bûn, Ermeniyên ku li Kobaniyê wek xemlekê bûn: Bêhna şaristaniya rojavayî ji wan dihat, ji şer û hevrikiyê hej nedikirin, heye ku ji ber hemî tadeyên li wan bûnî be. Pirraniya wan ji aliyê Tirkîyê hatibûn. Hemîyan bi kurmancî dizanibûn. Kurmanciya hinekan sed ji sedî wek ya me bû, -



-lê ya hinekên din piçekî şkestî bû. Mezinên wan baş bi tirkî dizanibûn û carine bi hev re bi tirkî diaxaftin. Li bajêr, çend malên Kurdan û mamûran ne tê de, hemî cînarên mala me ermenî bûn û hema bêje hemî ermenî dost û nasên bavê min bûn. Wî û wan bi tirkî bi hev re diaxaftin (Hîmê tirkîya min jî ji wir e). Havînan carine dostên bavê min dihatin gund û ta nivê şevê li nav baxê (rezê) me stranên bi tirkî û ermenî dihatin gotin; demên weha xweş bûn ku dê ta mirinê di bîra min de zindî bimînin.

Baştirîn şûna daniştinê li bajêr "Qehweya" Karmên bû, şûneke li teniştê rûbarê di bin daran de jî bi ser de bû. Baştirîn dukana li bajêr ya Lîwon (Leon) bû, cigareyên corbîcor, ji hemî babetan alkuhol, bîraya sûrî û baştirîn şekirên reng - rengîn lê hebûn. Baştirîn berberê bajêr Mecîd bû, ku bi xwe siryanî bû. Canîk paktirên goşt li bajêr difiroto û xweştirîn kebab çêdikir. Pişesazên bajêr: Qilêçî, nalbend, kulavçî, hesinkar, necar... hemî ermenî bûn. Yekem otomobîlên bajêr yê bi pereyan kar dikirin yê Ermeniyên bûn û şofêrên wan ermenî bûn.

Lê motora livandina Kobaniyê bi saya gundên pê ve girêdayî zindî dima. Li rojhilat gundên wê xwe ji deşta Sirûcê digîhandin Qeracê Şêxan û derbas dikirin. Li aliyê rojava û başûr xwe digîhandin kêleka çemê Ferêt. Şênîyên wan xwe bi çandîniyê û pezxwedîkirinê xwedî dikirin. Li van gundan êl û eşîrên Kurmancan û çemelên wan ji hev kişiyabûn û belav bûn, ji Mîran û Beraziyan bigir ta Kêtikan. Ji şax û çemelan dihatin Elêdînan, Şêxan, Serxweşan, Qalîkan, Şêx-Heyderîyan, Qeremdalîyan, Mi'êfan, Pîjan, Hesotan, Şeddadan, Qerîşan, Zînikliyan, Bêskan û hinekên din. Çemelên wan li aliyê din yê sînor jî hebûn, lê xeta hesinî û mayînan ew ji hev veqetandibûn.

Dema Sûriye di nîsana sal 1946 de ji bin serpereştîya fransî derket û serxwebûna xwe bi dest xist, Kobanî êdî bû bû bajarokekî rêkûpêk, xwedan sera, postexane, dadgeh, xwendegeha destpêkê, belediye û xizmetên din bû. Kurdên herêma Kobaniyê jî, wek Kurdên Cizîreyê, Çiyayê Kurmênc, Şamê û şûnên din ji bo serxwebûna welêt têkoşiyabûn û li bendê bûn ku di Sûriye ya nû de hevvelatîyên xwedan mafên rewşa û wekhevîyê bin.


Xwerist bi Kobaniyê re dilsoz nema! Berê leheyê nakeve aqilan ji bakur hat û gola avê tîji xwelî kir. Dihêt bîra min çawa bavê min wê şevê, li dû bihîstina qîrîna cînarên me yê ermenî, xwazt biçê hawara wan, lê dema bi nêrdewanan daket xwarê şemîtî û ket: Bazîne stuyê wî şkest... Dû re Qineya Romanan ya ku bi sedan sal av ji aliyê rojava dihanî û di bin bîran re digîhand wê navendê hişk bû û li dawîya dawiyê bajar bi tevahî bêav û tî ma. Tu dibêjî qey salên yekgirtina Sûriyeyê û Misrê bû bûn sînorekî demî: Ji wan salan û pê ve xwerist her miqristir û av kêmtir bû! Ew motorên ku li deşta Sirûcê şev û roj av ji bîrên "ertiwazî" dihanî der û bi wê- ... **Dûmahîk Rûpel: 23**

KOBANÎ ... Dûmahîk:

-avê zevî dihatin avdan, bi derbasbûna demê re bêdeng man. Firing (bacanên sor), bacan (bacanên reş) û îsotên ji Helinc û Şêranê dihatin neman; zebeşên ji Mezreyê û Minazê dihatin kêmbûn, şênîyê bajêr, bi encama koça ji gundan, sal li dû salê zêde bû, bajar ji hev kişiya, lê nikaribû xwe ligor zêdebûna şênîyê xwe amade bike; û Ermenyan, ewên ku li Kobaniyê xwedan kilîse, xwendegêh û dost bûn ji bajêr xatir xwaztin, heta bi goristana miriyên xwe be jî li şûn hiştin.

Lê hîm û sermîyanê Kobaniyê her xelkê wê bûye, û ligel dilreşiya xweristê û neadilmendiya dem û dewranê jî, ew gela hîn maye û dilê vî bajarî li dû yekem sedsala xwe hîn bi germî lê dide. Pişesazên wê, bazirganên wê û xwediyên firoşgehên wê nuha hemî ji wî warî bi xwe ne. Erê Mustafa Xidir nema bizava komonîstkirina ciwanan dikêye, Mişoyê Bekebûrê û Baqî Xido nema stranên Memê Alan û Dewrêşî Evdî li odeyan dibêjine, Hirço û Bozanê Şehîn Begê nema li Mikteleyê ne, di odeyên Besrawî û Mechên de bi dehan kes şev li dû şevê li hev kom nabine, Muftiyê Kobaniyê serkêşiya nimêja îniyê nake, muxtarê Kobaniyê, Hebeşê Zînê, Sîno, Gerebêt Xaçadoryan, Bêdo, Mihemed Elî Soreklî, Mustefayê El-Tipo, Hec Hemo, Berkel, Mustefayê Elê, Hesê Nebê, Husênê Elûş, Şukriyê Axcên, Şêx Sehen, Şêx Şekiro, Mehmûdê Hec Mustefê, Hec Mustafa, Salihê Xano, Muslim Çawîş, Hec Reşad, Mezinê Seydayan, Hec Muslim, Miş-Ennabî, Bozancikî, Nariko û bi dehan daniştvanên salên destpêkê nema li wir in, ne jî Çermo di kolanên bajêr de li ser lingan e; û Temo jî nema avê bi ser kevirên reş yê navenda bajêr de direşîne, hemiyar ji Kobaniyê koç kirine. Bi hezaran ji law û keçên Kobaniyê û gundên wê jî jê koç kirine û li seranserê çihanê belav bûne, lê evîna wan ji bo Kobaniyê û xelkê wê weqa bêhûde ye ku ew li ku bin jî navê wê her roj bi bîr dihînin. Dilên wan weqa bi wê şûnê re dilsoz û wefadar in ku hinek ji wan navê xwe û "Kobanî" bi hev de girê didine. Ligel ku "felek xayin" û xwerist nedilsoz bûye jî, nîfşê nû gol û rûbarên ber bi hêviyê û amancên mezin bi rê dixine. Kobaniyê, bila sedsaliya te li daniştvan û dilsozên te, û li warê ku tu beşekî jê yî, pîroz be û bila siberoja te yeke geştir û xweştir be.

(01/2011)

CEGERXWÎN JI KURDAN ÇI DIXWAZE?**SEYDA BESE****Melle Nûrî yê Hesarî**

(1934 – 2011)

(Qamişlo)

Seyda tu sipî bû ez nizanîm çî dixwazî
Tiştê ez bibêjim neke gazin ji birazî
Çil sale vebûrîn di xebatê tu dibazî
Pirtûk te nivîsîn tu di wan de bi niyazî
Her dem tu dibakî tu dinalî wekî sazî
Lê her ez nizanîm tu ji kurda çî dixwazî

Zanim tu dibê Kurdîm ji kurdê va çiya me
Kurmancîm ji Tûrê me li pê bav û diya me
Dilsojê welatim ez li pê jar û biya me
Dilxwazim ji Kurda re hevalê dil-tiya me
Dijwarim neyarê wan kesê ser kursiya me
Lê her ez nizanîm tu ji Kurda çî dixwazî

Pesnê te ji Kurda re seraser bê jîmarin
Ronik ji ser û rûyê te li ser wa pir dibarin
Carek tu dibêjî em gelek mêr û şiyarin
Pê de tu dibêjî em hemû kêmbûn hejarin
Dîsa tu dibêjî em çima dostê neyarin
Lê her ez nizanîm tu ji Kurda çî dixwazî

Axa dibê Kurdîm tu dibêjî xwedî zêre
Seyda dibê Kurdîm tu dibê ew ji xwedê re
Xwenda dibê Kurdîm tu dibê hêjî ne xêre
Cotkar dibê Kurdîm tu dibêjî ne bikêre
Yê tu dibê Kurdîm ka bibêje ne veşêre
Lê her ez nizanîm tu ji kurda çî dixwazî

Seyda em nizanîm gelo ew Kurdê te kîne
Jîna tu dixwazî em nizanîm ew çî jîne
Tu bûyî evîndar ez nizanîm çî evîne
Bo çî te hilanî dev û navê Cegerxwîne
Bersiv ez dixwazim tu ji bona me bişîne
Lê her ez nizanîm tu ji kurda çî dixwazî

Cenga meye deh sal tu dibêjî ne tu cenge
Em çûne hewarê tu dibê rabe derenge
Karê me çilo bî tu dibêjî ne tu renge
Dengê me bela bû tu dibêjî ne tu denge
Dijmin çilo bakî tu dibêjî wilo şenge
Lê her ez nizanîm tu ji Kurda çî dixwazî

Warê tu dixwazî ev çî êmal û welate
Cenga tu dixwazî ka çî talan û şewate
Karê tu dixwazî ev çî teqdîr û xebate
Dostê me bibêje li ro-ava rohilate
Hosta tu bi çêke ev çî qîr û kêferate
Lê her ez nizanîm tu ji Kurda çî dixwazî

Ger em bidin pê Rûs tu dibê em pê re xwarin

Em herne Emêrka tu dibêjî wekî marin
Ger em herne çînê tu dibêjî ew çî Karin
Em herne Îranê tu dibêjî xo neyarin
Tenha em bimînin tu dibêjî çî hejarin
Lê her ez nizanîm tu ji kurda çî dixwazî

Seyda tu dibê kes nebê em Kurd bidin pê Rûs
Dijmin çilo bêjî bira em tev xo bixin lûs
Da kurd bêne sotin ji me şewqê bide fanûs

Sed salî bimîne heye ku Rûs bike namûs

Şûva me genim lê simbilê me wê bibin sûs

Lê her ez nizanîm tu ji Kurda çî dixwazî

Aştî tu dixwazî lê neyarê me dikî zor
Hûrik tu dibazî bixwe dijmin zû diçî jor
Ala me li jêre tu dixwazî bêraqa sor
Rûs û Emerîka herdu çavê me dikin kor
Yek alî nebînî tu binêre li hawîr dor
Lê her ez nizanîm tu ji Kurda çî dixwazî

Kurd vane li pêşin lê tu pir maye li dûrî
Nêzîke azabin lê tu wek pêşî* dizûrî
Doza te bi pêşî vaye bihtir jê bihûrî
Kurda daye topa lê tu hêjî li pê şûrî
Êk vana dibêjî tu bizane ewe Nûrî
Lê her ez nizanîm tu ji Kurda çî dixwazî

* Pêşî: Kelmêş

- Ev helbesta seydayê Mele Nûrî di dîwana wî ya ku li bajarê Qamişlo di sala (1995) an - hatiye çap kirin de tune.

- Ev helbest ji destnivîsa Melle E'bdil Rehman ya helbestan (Evdiyê Kurimî) hatiye wergirtin. (DILNAME)

KOÇKIRINA**MELLE NÛRÎ YÊ
HESARÎ**

Di roja (25-1-2011) an de Melle Nûrî yê Hesarî koça dawîn ji jîyanê kir. Bila serê dost û nas û malbata wî sax be.

Rojnameya DILNAME

(25-1-2011)

ASIAN CUP - AFC QATAR (2011)



JAPAN ÇAREMÎN CAR LEHENGÊ CUPA ASYA YE



Japan (1) × (0) Ustralia



Di roja (29-1-2011) an de, li paytexta welatê Qeter ê - bajarê Dewha, fainal ê Cupa Asiya bi dawî bû, û welatê Jaban ê bi goleke ji welatê Ustraliya vexwar, û Japan bû lehengê Cupa Asiya yê sal (2011) an. Her weha lîstikvanê pêlgogê yê japanî Honda wek baştirîn lîstikvan ji aliyê FIFA yê û di vê cupa yê de hate hilbijartin.

Hêjayî gotinê ye ku welatê Japan ê heft caran di Cupa Asiya de beşdar bûye, û di hinderê (19) salan de - ji sal (1992) de ev çaremîn care ku Cupa Asiya qezenc dike. Japan di evan salan û cupeyan de bûye lehengê Asiya: 1- 1992. 2- 2000. 3- 2004. 4- 2011.

Japan di van pêşbirkên navnetewî de beşdar bûye: 1- **World Cup** di salên: (1998 – 2002 – 2006 – 2010). 2- **Olympic** yên peyan di salên: (1936 – 1956 – 1964 – 1968 – 2000 – 2004) 3- **Confederations Cup** di salên: (1995 – 2001 – 2003 – 2005). 4- **Cupa Asiya** û **Oqyanosiya** di sala: (2001).

Salên ku di **Cupa Asiya** de jî beşdar bûye evin: (1988 – 1992 – 1996 – 2000 – 2004 – 2007 – 2011).

Di **Cupa America** ya herêma başûr de jî, wek mîvan di sala (1999) an de beşdar bûye, û dê di vê sala (2011) an de jî dîsa wek mîvan beşdar bibe.

Xuya ye ku geşbûna pêlgoga Japanî ji sala (1988) an de destpêkiriye, û ana di herêma Asiya de, ew di pêpeloka yekem de ye, ji aliyê qezenc kirina cupa û lehengiyê û her weha di asta lîstikvanan de, gellek lîstikvanên wê li ewropa dilîzin, û lehengî û cupa yên di hinderê Japan ê de jî di asteke baş de ne.

FIFA BALLON D'OR (2010)

LIYONÊL MÊSÎ BAŞTIRÎN LÎSTIKVAN Ê PÊLGOGÊ YÊ SAL (2010) DI CÎHANÊ DE YE



Di roja (10-1-2011) an de li bajarê Ziyorêx yê Siwêserî, lîstikvanê Arcentînî û yê Tîma Barşelona yê Spasnî Lyonêl Mêsî wek baştirîn lîstikvanê pêlgogê yê sal (2010) ji aliyê FIFA û kovara Frans Fotbol ya frensî de hate hilbijartin, û Goga Zêrîn wek diyarî wergirt.

Hêjayî gotinê ye ku Mêsî baştirîn lîstikvanê pêlgogê yê sal (2009) an bû jî, û her weha Sola Zêrîn jî bi boneya pirtirîn golên (34) wî yên di Ewropa de bo sal (2010) an wergirtiye.

MARTA BAŞTIRÎN LÎSTIKVAN A PÊLGOGÊ YA SAL (2010) DI CÎHANÊ DE YE



Ji jinan, lîstikvana pêlgogê ya Berazîlî Marta wek baştirîn lîstikvana pêlgogê ya sal (2010) ji aliyê FIFA de hate hilbijartin. Hêjayî gotinê ye ku ev pênc salin li pişt hev, Marta wek baştirîn lîstikvan a jin di cîhanê de tê hilbijartin.

SÎLVIYA NAYID BAŞTIRÎN COACH A PÊLGOGÊ YA SAL (2010) DI CÎHANÊ DE YE



Coach a Almanî ya pêlgoga jinan Silviya Nayid wek baştirîn coach a jinan ya pêlgogê - sal (2010) ji aliyê FIFA û kovara Frans Fotbol ê de hate hilbijartin.

COZÊH MORÎNYO BAŞTIRÎN COACH Ê PÊLGOGÊ YÊ SAL (2010) DI CÎHANÊ DE YE



Coach ê Burtugalî yê pêlgogê Cozêh Morînyo wek baştirîn coach ê pêlgogê sal (2010) hate hilbijartin. Hêjayî gotinê ye ku Morînyo di hinderê sala (2010) an de, sê cupa - wek coach - bi Tîma Enter yê Italî re qezenckirine.